

PÊNÛSA



Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê

rojnameyeke çandî ye ji weşanên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê hejimar '6' çirya paşî 2012

Madlîn Şaqo

ma di robi@hotmail.com

Sirûdên kurdî ji bo fêrkirina zarokan

A.B.C.Ç.D.E.Ê
F.G.H.I.Î.J.K
L.M.N.O.P.Q.R
S.Ş.T.U.Û.
V.W.X.Y.Z

Va min AB kurdî got
ka bêje ma tu zanî

...
7 roj di heftiyê de hene
ez navê wan dizanim
şemî , yekşem û duşem
sêşem, çarşem û pêncşem
În roja dawî ye
dibistan tê tuneye
emê herin nav zozan
bikin govend û dîlan

...
Tîpê kurdî du beşin
wey lê wey lê
wey wey lê
ew dengdêr û dengdar in
wey lê wey lê
delalê
dengdêrê me 8 tîp in
wey lê wey lê

wey wey lê
5 dirêj û 3 kurt in
wey lê wey lê
delalê
23 tîp dengdar in
wey lê wey lê
wey wey lê
ew raza yî û xewar in
wey lê wey lê
delalê
...
dema ez diçim dibistan
dikim çente pir tiştan
pênûs, jêbir ,biroke
rastkêş, lênûs, pirtûka
eman eman eman
eman eman eman
Şagirt im
Ez şagirtekî kurd im
pir jêhatî û çeleng im
li mamoste guhdar dikim
çi bipirsê bersiv didim
eman eman eman
eman eman eman
Şagirt im

Welat Şêro

Cegerxwîn parêzvanê zimanê kurdî

Bîst û heşt Sal derbas dibin ser koçkirina hozanvan û torevanê kurd cegerxwînê hesarî yê ku cihê xwe di dilê her kesê kurd de çêkir , mîna Berzanî û şêx Se-îd , cezerî, û xanî çaxê merov di pirsê gelo vî kesî çawa û bi çi ???

navê xwe di nav gelê xwede belav kir û cihêkî xweyî fireh û mezin di dil û ramanê wîde çêkir ?! bersiva vê pirsê xweş zelal dibê çaxê merov nivîsanê wî di xwênê, wê hingê merov raman, daxwaz û armencê wî nasdikê, û xweş yek dighê baweriyêke bê goman bi mezinbûn û buhabûna cegerxwîn û buhabûna kar û xebata ku di ber gelê xwede kirî çi ji hêla ramande û çi ji hêla paristina zimande. gelo cegerxwîn kî bû, çi di xwesit, armencên wî çi bûn???... Rû(7)

BAJARÊ "RIHA"



Riha (bi tirkî: Şanlıurfa, bi erebî الرها / ar-Ruhā, bi suryanî Urhoy), bi yewnanî Edessa, yan jî bi tenê Urfa) parêzgeh, navçe û bajarekî bakurê Kurdistanê (digel Tirkiye) ye.

Dîrok

Riha di cîhanê de bajarekî herî qedîm û kevnare ye. Her wiha di dîrokê de Riha wekî hêlîna mirovahiyê û qada şaristanyê tê zanîn. Heta niha gelek şaristanî hatine li ser vê axê serwer bûne. Li ser axa Rihayê gelek şerên dijwar pêk hatine. Dema ku navê Rihayê tê lêvkirin warê Nemrûd û Îbrahîm pêxember tê bîra mirovan. Dema ku navê Rihayê tê lêvkirin şerê Îbrahîman ê li hemberî Nemrûdan tê bîra mirovan..... Rûpel (5)

Jan Dost

Danerê yekemîn ferhenga kurdî-erebî:

Yûsif Diyaaddîn Paşa El Xalidî



Danerê yekemîn ferhenga kurdî-erebî ku navê wê "El Hediyye Elhemîdiyye" ye, Yûsif Diyaaddîn Paşa Elxalidî (1842-1906) ye.

Yûsif Diyaaddîn, kurê qaziyê Meraş û Erzeromê Mihemmed Elî ye, kalikê wî ji hêla dê de, Mûsa Elxalidî, qaziyê Anadolê bû. Wî di biçûkanîya xwe de li camiya El Aqsayê xwend û pişt re xwest berê xwe bide zanîngeha El-Ezher ya Misrê, lê bavê wî berê wî da girava Maltayê da ku di fakulta Protistantî de bixwîne..... Rûpel (3)

Şêx Adî

ji nas bike

Şêx Adî mirovekî bi keramet û xwedênas û zana û reformkarê ayîna êzdiyatîyê bûye. Ew di navbera salê 1073 û 1162'an de dijiyaye. Parastina Şêx Adî di nav hebandina êzdiyan gelek giring e û roja îro gora wî li perestgeha Lalişê cihê ziyaretê ye.

Jinenîgarî

Li ser bûyîn û nijada Şêx Adî tiştên ji hev cuda tên gotin. Hinek dibêjin, Şêx Adî li Colemergê ji dayîk bûye, hinek jî dibêjin li Lubnanê. Bi gor cîhê dayîkbûna wî jî, hinek dibêjin Şêx Adî kurd e, hinek jî wî ereb dihesîbînin. Dema dayîkbûna wî jî bi tevayî ne eşkereye..... Rûpel (8)

BONIYE-

suad Cegerxwîn Koçkirina bavê min



Şevekî şeva, ji çirya pêşî
Ewrekî giran l' kurdan hilkêşî
Stêrkeke bilind , j'ezmana, xuşî
gerdûn tarî kir , qitrana û reşî
ez li malê bûm, d' xewneke şêrîn
Dengekî bi jan, hat qîr û girîn
Dengê Azad bû, li tîlefona min
Saxbe serê te , êdî xuşka min
Xoşbe herdemî , tevî zarên xwe
Hew tu bi bînî, derd û kulên xwe
Rabe xuşka min, tu were ba me
Gel me tevan be , parke kulên me
..... Rûpel (13)

Dr. Ehmed Xelîl

dralkhalil@hotmail.com

Deh tembî ji bo ramyarên kurd

(**Tembiya 8an**)



Kanî Hêza Me Ya Neteweyî?

Zanebûna rasteqînan gaveka girînge di serkeftina tekekesan û gelan de, û yek ji rasteqînên ku zanyaran çespaniyê- hema ji dema zanyarê inglîz Tşarlz Darwin de- ewe ku her tiştekî xwedî jîyan dikeve bin bandora zagona "Pejirinda Xuristî" an "Pejirinda Xwejberî", wateya vê zagonê ewe ku mayîn para aferîda bihêztire, û her aferîdek ku di va cenga hebûnê ya gewre û tevayî de bisernekeve, ewê- zû an derengberve tinebûnê here.

Eva rasteqîneka dîrokî ya bêgumane, û çar rasteqînan herî girîng jê tên peydakirin; ewan jî evin:

Çar Rasteqînên Dîrokî:

Rasteqîna Yekemîn:

Ji berbanga dîrokê de, erdnîgarî (ciyografî)- bi her wateyên xwe yê îkoloçî, abûrî û ciyoramyarî- mijara hevdijîtiyêye di navbera gelan de, her gelek hewldide ku destê xwe deyne ser erdnîgariya baştir, ji bo va armançê agirê gelek cengan hat dadan, û imperatori hatin avakirin, û Hêza Gewre hêmana herî girîng bû ji bo serkeftinê di va çarçewê de.

Rasteqîna Duwemîn:

Hevdijîtiya ji bo bidestxistina erdnîgariyê, di navbera gelan de, hên domdike, wa binêrin çawa hin gel gelên din dagîr dikin! Binêrin çawa hin dewlet bûne cirîtbaz; da ku cemsêrê bakur û başûr, kûraniya deryayan û asoyên asemînan bixin bin destlatdara xwe! Hên Hêza sert (leşkerî) û Hêza nerm (idyolocî)- wek Hirfrid Monklir di pirtûka "Imperatorî, rû 103" bi nav dike- hêmana tewrî girînge ji bo serkeftinê.

Rasteqîna Sêyemîn:

Ji (2000 b.z)de, Rojavaya Asyayê- ji Îranê ta beravên Derya Sipî- penava hevdijîtiyê ye ji bo bidestxistina erdnîgariyê, hin caran hevdijîti di navbera gelên Rojavaya Asyayê de bû (Pêşiyên kurdan, Ekkadiyan, Babilîyan, Aşuriyan, Hîtiyan, Aramiyan, Ken'aniyan, Ibraniyan, Kildanan, Farisan, Ereban), û hin caran jî di navbera gelên êrişvan yê ji dervayî Rojavaya Asyayê dihatin (Misriyan, Grîkan, Romanan, Bîzentiyan, Mogolan, Teteran, Tirkan, Firengan, Ewropiyên nû), di va hevdijîtiyan de, hêza sert û nerm hêmaneka girîng bû ji bo serkeftinê.

Rasteqîna Çaremîn:

Kurdistan navenda Rojavaya Asyayê ye, û her êrişvanek neçar dibû ku kurdistanê bixe bin destlata xwe, da ku karibe derbasî deverên Rojavaya Asyayê yê be, an jî pirojeya wî ya êrişvaniya ê bi serî nebû ya, helbet di dîrokê de gelek nemûne hene, yek ji wan, perçekirina kurdistanê di navbera çar dewletên dgîrker de ta îro.

Pêwîstiya Hêzeka Gewre:

Bi kortî, hêz- bi hemî rengên xwe- hêmana herî girînge, ji bo bidestxistina erdnîgariyê, û wateya dagîrkeriya kurdistanê ta niha

ewe, ku kurd ne xwedî hêza ku karibe xwe û welatê wxe biparêzin, û a rast ew, ku ewê nikaribin- bêyî hêzeka

gewreya tevayî- welatê xwe rêzgarbikin, xencî vê jî, du hêmanan dî yê gelek girîng pêwîst dikin ku kurd xwedî hêzeka gewre bin:

1 - Xweristiya Dagîkerên Kurdistanê:

Tê zanîn ku dagîrkerên ewrupî, di çerxa (19, 20) de, erdnîgariya hin gelan xistin

destên xwe ji bo sê ermancan: bikaranîna dahatiyên aburî (zevî, filiz, pitrol), û bikaranîna dahatiyên mirovî (karmendên astenizm, karker, leşker), û bikaranîna erdnîgariyê di çarçewa ciyoramyarî de, lewre welatê ku dagîrker kirinê hinekî pêşda dan ji hêla şarsitanî de, bala xwe nekşandin ser hilweşandina ziman û kultûra gelan, û çaxa gel li dijî wan serî hildan, hin perlemanter û gelên ewrupî daslatdarên xwe yê dagîker rexne kirin, û bûn alîkarê gelên bindest.

Lê dagîrkerên kurdistanê beşekî dagîrkerî yî susrete, armanca wan ne tenê standina sermiyan û dahatiyane, nexêr, armanca wan ewe ku welatê me ji dest me bigrin, me tede wek kola bikarbînî, kultûra me wenda bikin, pirojeyên esilmîsyonî li ser me bi rêde bibin, me bavêjin nav lepên belengaziyê, nezaniyê û istuxariyê, me bavêjin dervayî dîrokê, ewan neviyên şufîniyê û hovîtiyê ne, xwînrijandin qet ne xema wane, û tiştê metirster ewe ku wan gelên xwe li ser hizra êrişvaniyê û talaniyê perwerde kirine, hele werin em bipirsîn: ma ti carî gelên faris, tirk, ereb û nîvereb (مستعرب) ti carî bûn alîkarê mafên kurdan yê neteweyî?

2 - Xweristiya Ramyariy Navnetewî:

Ta îro, (Hêz), ne (maf), bingeha ramyariya navneteweyî ye, û (bercewendî), ne (mirovani), fermandarê ramyariya navneteweyî ye, ta îro, kultûra demokratîyê û mafên gelan nikarin şaşîtiyê sererast bikin, wa binêrin çawa pênc dewletên xwedî hêza gewre (Emerika, Birîtanya, Firensa, Rûsya, Çîn) mafê (vîto) xistine para xwe! Wa binêrin çawa di rêya kurdistanê serbixwe de dibin dirî û kelem, û şûreşa kurdên bakur dixin xaneyê tîroristiyê, û çavên xwe li ser hovîtiyê rêcîma tirk dadimrînin?

Daxuyanî:

Ev gotara roja 1 – 8 – 2012 bi zimanê erebî hatibû weşandin.

Jem Dost

Danerê yekemîn ferhenga kurdî-erebî:

Yûsif Diyaaddîn Paşa El Xalidî



Danerê yekemîn ferhenga kurdî-erebî ku navê wê “El Hediyeye Elhemîdiyye” ye, Yûsif Diyaaddîn Paşa Elxalidî (1842-1906) ye.

Yûsif Diyaaddîn, kurê qazîyê Meraş û Erzeromê Mihemmed Elî ye, kalikê wî ji hêla dê de, Mûsa Elxalidî, qazîyê Anadolê bû. Wî di biçûkanîya xwe de li camiya El Aqsayê xwend û pişt re xwest berê xwe bide zanîngeha El- Ezher ya Misrê, lê bavê wî berê wî da girava Maltayê da ku di fakulta Protistantî de bixwîne.

Du salan li wir ma heta birayê wî Yasîn ew şande Stenbolê da ku bijîşkiyê bixwîne, lê dilê wî û wê xwendinê nebû, îca piştî salekê dev jê berda û tevli fakulta robert a Endazyariyê bû. Sal û nîvekê li wir xwend û ew jî bi hoyê mirina bavê xwe, terikand û vegeya Qudsê. Dema ew li Stenbolê bû destpêkirina vekirina dibistanên nûjen û modern dît û xwest li Qudsê jî tevgereke wiha bike. Bi alîkarîya Raşid Paşa waliyê Sûrî sala 1867’an de, yekemîn dibistan bi navê Dibistana Reşîdî vekir. Lê hêviyên wî hemû têkçûn dema gerîndeyekî tirk ji Stenbolê anîn û ew nekirin gerînde.

Yûsif Diyaaddîn Paşa Elxalidî

Piştî ew bû Serokê Şaredariya Qudsê û şeş salan ew di wî karî de ma. Di wan şeş salan de gelek xizmet ji bajêr re kirin, kolanên nû ji bo peyadeyan çirandin û rêyên asphalt ji bo erebaneyan di navbera Quds û Yafa de û kehrîzên zêrêmîn û gelek karên din. Piştî demekê ew ji serokatiya şaredariyê hate pekandin.

Sala 1874’an de dostê wî Raşid Paşa bû wezîrê karên derve yê dewleta Osmanî, û ew vexwend Stenbolê da ku wekî wergêrekî di Babi Alî de kar bike. Di wergeriyê de şeş mehan xebitî û piştî bû cîgirê Qonsolosê Osmanî li bendera Botî ya Rûsî li kenarê Rerya Reş.

Lê Raşid Paşa di wezaretê derve de dirêj nekir û Yûsif jî bi wî re ji karê xwe hate avêtin. Wî ew yek wekî fersendekê dît ku li Rûsyayê bigere û ji nêzik ve wê nas bike. Ew li bajarên wekî Moskov, Kiyev, Odîsa, Petesburg heta sala 1875’an geriya.

Piştî wê bi alîkarîya dostê xwe yê kevin Raşid Paşa yê ku bûbû Balyozê Dewleta Osmanî li Otrîşê (Nemseyê) bû mamosteyê edebiyata erebî li Viyanayê.

Tebaxa (Gelawêja) 1875’an de ew vegeya qudsê û careke din bû serokê şaredariya wî bajarî. Di destpêka sala 1877’an ew wekî mebûsê muteserrifiya qudsê, di Meclisa Mebûsan de hate hilbijartin.

Di meclisê de wî dijberiya Siltan Ebdilhemîdê duyem kir û bû piştgirekî çalak ji bo destûrê (meşrûtiyê).

Dem ku meclis bi biryara Siltan Ebdilhemîd di sibata (reşemiya) 1878’an de hel bû, ew jî bi deh mebûsên din re hate



sirgûn kirin û vegeya Yafayê û piştî Qudsê û ji bo cara sêyemîn bû serokê şaredariyê. Sala 1881’ê de bû qaymeqamê Yafa û piştî Merciyûn li Lubnanê. Di dawî de bû hakimê Mutkî li Bedlîsê û li wir fêrî zimanê kurdî bû û ferhenga xwe ya navdar “Elhediyeye Elhemîdiyye” nivîsî. Ferhenga wî di sala 1893’yan de li Stenbolê çap bû.

Pirtûka wî bi çêşeke mezin ji hêla rewşnebîrên kurdan ve li herêmê hate pêşwazî kirin û gelek kesan mîna: Hesên Fehmî Efendî muderrîsê dibistana Salihîyê li Sêrtê, û Şêx Evdirrehman kurê miftiyê Sêrtê û Mele Mistefa kurê Şêx Hesênê navborî û hin kesên din, ku hemûyan jî helbest di pesnê wî û ferhenga wî de nivîsîn.


Yûsif Ziya paşayê ku ev xizmeta mezin ji bo zimanê kurdî kir, sala 1906’an de li Stenbolê wefat kir.

Jêder:

Navdarên Kurd û Kurdistan di serdema Islamî de- Mihemed emîn Zekî.

Chapxane ya el Tefeyyuz- Bexdad 1945.

Malpera malbata Xalidîyan. www.khalidi.info.



Hoşeng Broka

hoshengbroka@hotmail.com



De Amedeke din jî wer e!

Ji destên Arjen Arî re..

destên te çawa ji destên Amedê bûn malava!

Xwezî min aneha piştî pnceşêrê bi tembîkekê, bidîta.. ka destên te çawa ji ser milên Amedê peya dibin!

Xwezî aneha tu li helbestê mikur behata , ka destên te çiqasî bêriya destên Amedê kirine!

Xwezî bi wê êvarê, ku em helbest û helbest, bi xwe re, birin!

Ne xwezî bi vê êvarê, ku mirin û mirin, tu ji xwe re birî!

Êvar, vê mirinê ku ji ser destên Amedê peya nabe, hişîn û bédeng e.

Dest, hişîn û bédeng in.

Hest, hişîn û bédeng in.

Helbest, hişîn û bédeng in.

Amed, hişîn û bédeng e.

Amed aneha êvar e, êvar Amed e, ku dibe destekî vegirtî, silavên destên dawî, qefdên gulên dawî û helbestên pirtûkên dawî, defterên bîranînên dawî, kêlikên hesretên dawî û tembîkên dawî, pencere bi pencere, belav dike.

Amed aneha êvar e, êvar Amed e, ku çiroka destên dawî ji pencereyên dawî re, vedibêje.

Amed aneha êvar e, êvar Amed e, ku çiroka mirina helbesta dawî ji Amedê û Amediyên re, dibêje.

Amed aneha êvar e, êvar Amed e,
ku ji penceşêrê heta bi penceşêrê ye,
ku ji mirinê heta bi mirinê ye,
ku ji qederê heta bi qederê ye,
ku ji destan heta bi destan,
û ji helbestan heta bi helbestan e.

Amed aneha êvar e, êvar Amed e, ku dibe heyamek ba û destan di destan de, destan ji destan re û bi destan re, dihejmêre.

Êvar aneha dest in, ku Amed e.

Êvar helbest in, ku Amed e.

Êvar penceşêr e, ku Amed e.

Êvar mirin e, ku Amed e.

Êvar qeder e, ku Amed e.

Êvar aneha, li ser destên Amedê, bîra penceşêrê ye.

Amed aneha, li ser destên êvarê, bîra mirinê ye.

Hooo dostê êvarê,

hooo dostê piştî Amedê bi êvarekê,

hooo dostê piştî êvarê bi Amedekê,

de were looo...

Were, em Amedeke din jî, bibin êvar..bibin helbesteke şemirî di guhên êvarê de.

Êvar, vê Amedê bi qasî helbestê, qeder e.

Qeder, bi qasî Amedê, helbest e.

Helbest, bi qasî qederê, Amed e.

Amed, êvar, qeder, helbest û tu, vê mirinê çiqasî li bejna hev tîn looo..

Êvar, vê qederê hişîn e, ku hewqas dest in.

Dest, vê qederê hişîn in, ku hewqas êvar in.

Êvar û dest, vê Amedê hişîn in, ku hewqas qeder in.

Hooo dostê qederê...

De vê êvara ji destan, bi destan, berî destan û piştî destan, bi qasî bîranînên xwe, yên mişt destên qederê, were..

De vê mirinê, bi qasî helbestan, ku berê destên te ne, were..

De vê Amedê, bi qasî mirinê, ku qedera destên te ne, were..

De helbesteke din jî were looo..

Were, em Amed û Amed, helbesteke din jî bibin êvar;

were, em êvar û êvar, helbesteke din jî bibin kolanek ji kolanên Amedê;

were, em helbesteke din jî, xwe ji penceşêrê vedizin û derbasî êvarê bibin.

De helbesteke din jî were..

De Amedeke din jî were..

De êvareke din û qedereke din jî were..

Were em destan û helbestan, êvar û êvar, li pencereyên Amedê, belav bikin.

Were em Amedeke din jî, destên xwe yên negotî, ji hev re, bibêjin.

Were em helbesteke din jî, êvarê di destên hev de, hilîn in.

Were em êvareke din jî, bibin destên hev û helbestan di destên hev de veşêrin.

Ma ne em van destan, tev, êvar in;

ma ne em vê êvarê, tev, dest û dest in looo...

De Amdeke din jî were...

Were, em Amedeke din jî, bi qasî destan, ku bilind in, êvar û êvar, bigirîn.

Were, em Amdeke din jî, bi qasî destan ku penceşêr û penceşêr diçin, derbasî êvarê bibin.

Were, em Amedeke din jî, bi qasî êvarê, bibin dest û bi destan re, ji destan re û ji ser destan, helbestan biçinin.

De Amedeke din jî wer e, hooo dostê ji êvarê...

dest li hêviya guvaştina gotinên te ne;

gotin li hêviya êvarên li ser destên te ne;

êvar li hêviya helbesta ji jana dilê te ne.

Hooo dostê êvarê..

Ez dizanim ku vê êvarê destên te çi dibêjin.

Ez dizanim, ku vê êvarê, destên te, çawa çilmisî, sernişivê meyê, û gulên şevbider, dibin.

Ez dizanim, ku van destan û wê Amedê, êvar dê çende bêriya te bike.

Ez dizanim, ku vê êvarê, destên te, dê çiqasî gulên û axaftinên derengî şevê ji ser destên min biçinin.

Ez dizanim, ku destên te, vê êvarê, dê çende bêriya gulên û stiranên berî „kasa mirinê“ bi Amedekê, bikin.

Ez dizanim, ku vê „kasa mirinê“, tu çende êvar î.

Ez dizanim, ku vê êvarê, tu çende Amed û Amed, li mirinê, belav dibî.

Hooo dostê êvarê..

Hay a te, li wir, ku mirin kevî ye,

ku penceşêr kevî ye;

ku qeder kevî ye;

ku Amed kevî ye;

ku êvar kevî ye;

ku helbest kevî ye;

ku dest bi qasî dostan û dost jî bi qasî destan kevî ne, ji te hebe!

Hay a te li wir, ku kevî dawî ye û dawî jî kevî ye, ji te hebe!

Baş li xwe binere, bextê keviyan tune!

BAJARÊN XWE NAS BIKE

BAJARÊ ‘RIHA’

JI NÊZ VE NAS BIKE

Riha (bi tirkî: *Şanlıurfa*, bi erebî *الرها* / *ar-Ruhā*, bi suryanî *Urhoy*), bi yewnanî Edessa, yan jî bi tenê *Urfa*) parêzgeh, navçe û bajarekî bakurê Kurdistanê (digel Tirkiye) ye.

Dîrok

Riha di cîhanê de bajarekî herî qedîm û kevnare ye. Her wiha di dîrokê de Riha wekî hêlîna mirovahiyê û qada şaristaniyê tê zanîn. Heta niha gelek şaristanî hatine li ser vê axê serwer bûne. Li ser axa Rihayê gelek şerên dijwar pêk hatine. Dema ku navê Rihayê tê lêvkirin warê Nemrûd û Îbrahîm pêxember tê bîra mirovan. Dema ku navê Rihayê tê lêvkirin şerê Îbrahîman ê li hemberî Nemrûdan tê bîra mirovan.

Nav

Cîroka navê Rihayê wek dîroka bajêr tevlihev û kûr e. Navê herî kevin yê bajêr Edessa ye. Ev nav heta salê 300 berî zayînê dirêj dibe û ji dema Mekodoniyan maye. Navê Edessa jî aliyê Seleukos ve li bajêr hatiye danîn. Di salên 200 de, qralê Bîzans Antiochos navê xwe li bajêr kiribe jî, demeke sun ve navê wî hatiye jibîrkirin.

Li ser navê îro, yanî li ser peyva Rihayê gelek îddaa hene. Li gorî nezariyekî peyva Rihayê ji zimanê Suryanî ji peyva Orha/Orihaî tê, bi erebî jî ji peyva Vurihaî (Ava Pir) tê. Herwiha, hin kes navê Rihayê bi peyva yewnanî Osruan, hin kes jî bi peyva latînî Urfay va girêdidin.

Pishtre nav wek Riha, Urfa hatiye guhertin. Nav ji alî tirkan ve wek "Şanlıurfa" hatiye guhertin, lê bajar ji aliyê Kurdan ve Riha tê zanîn.

Kronolojiya bajêr

Berî Îsa (zayîn) b.z.

2000 - 1300 dema Mîtanî û hûriyan

100 - 612 dema Asûriyan

612 - 550 dema Medan

550 - 332 dema Persan

332 - 313 dema Makedoniyan

132 hukumdariya Osroene

Piştî Îsa (zayîn) p.z.

117 - 395 dema Împaratoriya Roma

395 dema Bîzansiyan

639 dema Ereban

1071 dema Selçukiyan

1514 dema Împaratoriya Osmanî

Eyûbiyan jî gelek sala hukimdarî li Rihayê kir.

Ciyên dîrokî

Herêm ji alî tarix ve pir dewlemend e. Kela bajêr



bajêr li navenda bajêr e. Mizgeft û gola Halil ul rehman jî ji alî gel û turîstan ve tîz ziyaretî kirin. Navça Xaranê bi xaniyên xwe yê taybetî jî bo turîstan ciyek gerê ye. Bendava Atatürk jî ji bo gerê û sporên ser avê ciyek mûsaîd e.

Erdnîgarî

Ji xeynî hêjayiyên xwe yê dîrokî, xwezaya Rihayê him li cîhanê him jî li welatê me cihekî girîng digire û di hundirê xwe de ajalên gelek nadîr xwedî dike.

Bajar di nav paralelên 36° 40' û 38° 02' bakur û merîdyenên 37° 50' û 40° 12' rojhilat de ne. Sînorên bajêr li bakur Semsûr û Diyarbekirê ve, li rojava bi Dîlok ve, li başûr bi Sûrî ve û li rojhilat jî bi Mêrdînê ve tê girêdan.

Pîvana erdêr bajêr 18.584 km² ye. Erdê herêmê % 22,0 ji çiyên, % 16,3 ji deshtan û % 61,7 jî ji platoyan pêk tê. Li herêmê genim, ceh, nîsk, pembo, tîrî û bi taybetî jî van salên dawî sebze û mewê jî li herêmê tîz çandin.

Li herêmê îkîmêk reshayî heye. Havînan germ û

zuha, zivistanan jî sar e, lê rojên bi berf li herêmê hindik in. Li herêmê ferqa navbera di germbûna şev û rojê pir e.

Çiyayên herêmê

Kismek ji çiyayê Qerejdaxê (1919 m) dikeve hundurê hudûdên herêmê. Çiyayê bilind li herêmê tunene. Navên çiyayên herî girîng wiha ne:

Çiyayên Takurtukir (1222 m)

Tektek (801 m),

Nemrûd (800m)

Arat (771 m)

Deşt, zozan, gelî û ajal

Derê ku em jê re dibêjin deşt li vir peyda ye. Di deştan de dar tune ne, bi tenê riweyên giyayî yê ku wek firkên yeksalî mezin dibin hene. Dema ku meriv ji dûr ve lê dinêre, tu ajal nayên xuyane û ev der wek col xuya dike û mixabin ajalên ku tê de dijîn nayin zanîn.

Di deştan de gelek ajalên cûda yê ku cinsên xwe pir kêmbûne tê de dijîn. Wekî gumgumokên mezin ên 1.5 metreyî, keftarên ku tenê di belgefîlman de serê xwe li hemberî şêran radikin û kergezên ku bejnê wan digihêje 2 metreyan.

Sedemên ku ev ajalên nayin zanîn ev e ku ewan, ji ber ku di deştan de dijîn, xwe baş vedîşêrin û hinek ji wan tenê di şevan de aktîf dibin e. Lê belê heger meriv hinek baldartir i vê deştê dinêre wê meriv karibe ev ajalên cûda û zindî yê ku xwe veşar dikin bibîne. Ev yek jî ferqa di nava nêrîn û dîtîne de ye.



Gelê navçeya Wêranşêra Rihayê nanê sêlê yê navdar gelekî çêdikin

Navên deştên Rihayê wiha ne:

Deşta Xarranê; Mezinbûna deştê 2750 km² ye.

Deşta Wêranşarê; Li rojhilatê deşta Xaranê ye. Mezinbûna wê 1200 km² ye.

Deşta Sirûcê; li rojava yê deşta Xaranê ye, mezinbûna wê 700 km² ye.

Deşta Curnê reş li rojavayê Qerejdax e.

Ajalên herî balkêş ên ku xwe di deştan de vedişêrin ev in:

Keftar

Varana deştan (Varanus griseus)

Kergezê bicûk (Neopron percnopterus)

Jojîya guhdîrêj (Hemiecbinus auritus)

Herwiha, navên ajalên din ên taybet:

Kelaynak (teyrên sergûrî)

Kew û kewroshk

Xezal

Rûvî

Çem û Gol

Çemê Feradê; Çemê herî mezin yê Kurdistanê ye. Ji erdên Semsûrê dikeve hundirê hudûdên Riha yê. Çem di nav sê welatan de diherêke û wala dibe Xelîca Besra yê. Çemên Culap, Cawsak, Belih, Xabûr û Zengeçûr shaxên Feradê ne û li herêmê diherikin.

Gola Halîl ul Rehman; 150m dirêj û 39 m fireh e. Li mizgefta Halîl ul Rehman e. Mehsî yê hundirê golê pîrozên û ji alî gel ve nayin girtin.

Gola Aynzeliha; 50 m dirêj û 30 m fireh e. Mehsiyên hundirê golê pîrozên û ji alî gel ve nayine girtin.

Gola mezin û ya biçûk ji golên din yê herêmê ne.

Gola Bendava Atatürk

Nifûs û navçeyên bajarê

Riha navçeya navendî jî di di nav de ji 10 navçeyan pêk tê. Nifûsa bajar nêzî milyonekê ye.

Di bajar de li gorî texmînan ji sedî 90 kurd, ji sedî 5 ereb û 5'ên din jî tev li hev in.

Navçeyên Riha yê herî mezin û qebralix Sêwreg û Wêranşar in.

Li Navçeya Sêwregê bi tevahî kurd dijîn û bi piranî eşîrtî serdest e. Bi taybetî li navçeya Sêwregê civat pir girêdayî axa ye.

Nifûs û navçeyên bajarê li gorî jimartina sala 1997an wiha ye:

Bêrecûg (Birecik), 93.006 (?)

Curnê Reş (Hilvan), 33.467

Hewag (Bozova), 70.019

Herran (Harran), 40.664

Kaniya Xezalan an Tilebyad (Akçakale), 62.454

Pirsûs (Suruç), 72.026 (?)

Riha (bi tirkî, Şanlıurfa) (navend), 535.412 rûniştvan

Serî Kaniyê (Ceylanpinar) 50.447

Siwêrek an Sêwregî (Siverek), 146.619

Wêranşar 163.975

Xelfetî (Halfeti), 35.500

Tevahiya nifûsa herêmê (tevlî gundan) 1.303.589 e

Aborî

Serwetên bin erdê

Herêm ji alî madenan ve ne dewlemend e. Li Rihayê tenê fosfat û malzemên ji bo tûxla û kiremîdan ji bin erdê dertên.

Çand û huner

Ol û civak

Bajarê Riha yê wek "Bajarê Pêxamberan" tê naskirin. Li gor rîvayetê gava Adem û Hewa ji biheshtê (cennet) tî qewrandin, tî li Xaranê bi cih dibin. Îbrahîm pêxember, Eyûb pêxember û Îsa pêxember

jî li herêmê mane. Li herêmê musilmantî ji elewî û sunnî yan pêk tê. Kurd, ereb û tirk piranî ya nifûsê teshkil dikin. Gelê Rihayê zêdetir bi çandinî û ajalkariyê ve mijûl e. Eleqeyê mezin nîşanî bazirganiyê nedaye û jiyana wan bi piranî li gundan domiya ye. Ji ber wê yekê ku çanda feodaltiyê û axatiyê serdest maye. Jiyan ji bajarvaniyê û şaristaniyê wêdetir di çanda gundan de girtî maye. Loma jî ji bilî vîn û biryara kes zêdetir biryara civak û eşîrtiyê li ser dest maye. Her wiha li hemberî gotina mezinên civakê an jî eşîrê zêdetir îtiraz pêk nehatiye.

Dengbêjên Rihayê

Xwarinên herêmê

Herêm ji alî xwarinan pir dewlemend e. Xwarinên herî pir li herêmê tî xwarin kutilkên dagirtî, Acîn(çikifte), beqlewe, kunefe (qedayif), kebeb û lehmeçun nin. Taybetiyek herêmê jî xwarina îsotên tûj yê sor in

Kincên herêmê

Di serê jinan de şarpeyek (yamşak) hene. Keçên ciwan kofiyek bi şarpeyek sipî (neçek) li serê xwe dikin. Li ser fistanên dirêj, çakêtek dirêj tê li xwe kirin. Îshlik bê yaxe nê. Şalwarên ku jêra wan teng di bin fistan de tê li xwe kirin. Di nigan de gorên hirî û pêlavên lastîk yê resh hene.

Zilamên herêmê entariyên ber wan girtî li xwe dikin. Çakêt, şalwar û îshlik jî li hinek deveran li xwe dikin. Di serê zilaman de "egalên sipî" hene. Di nigan de "qondere" yan jî "lastîkên resh" tê li xwe kirin.

Navdarên bajarê

Gelek kesen navdar ji herêma Rihayê derketine. Çendek ji wan ev in: Abdullah Ocalan, Murat Karayılan, Yılmaz Güney, Şivan Perwer, Îbrahîm Tatlıses, Müslüm Gürses, Nuri Sesigüzel.



Riha



Welat Şêro



Kemal Tolon



Cegerxwîn

Parêzvanê

zimanê kurdî

Bîst û heşt Sal derbas dibin ser koçkirina hozanvan û torevanê kurd cegerxwînê hesarî yê ku cihê xwe di dilê her kesê kurd de çêkir , mîna Berzanî û şêx Se-îd , cezerî, û xanî çaxê merov di pirsê gelo vî kesî çawa û bi çi ???

navê xwe di nav gelê xwede belav kir û cihekî xweyî fireh û mezin di dil û ramanê wî de çêkir !! bersiva vê pirsê xweş zela dibê çaxê merov nivîsanê wî di xwênê , wê hingê merov raman, daxwaz û armencê wî nasdikê , û xweş yek dîgê baweriyê bê goman bi mezinbûn û buhabûna cegerxwîn û buhabûna kar û xebata ku di ber gelê xwede kirî çî ji hêla ramandê û çî ji hêla paristina zimandê . gelo cegerxwîn kî bû , çî di xwesit , armencên wî çî bûn ??? cegerxwîn rayê wî di nav ava welat parêziyêde ji zarokiyêde şînbûn , ji zarokiyêve bi çavê xwe hovîtiya leşgerê tirka dît , bê çawa gunid wêran dikirin , serok û rêber û çî kesê bi nav bi darve dikirin yan jî di binê zindana werdikirin ji wê demêve ew wênê nexweş di nav şanê mejîde hatin veşartin , û bimezin bûna wîre ew wêne mezin dibûn , û derveyî vê êş û azarê , ji malbatê bi xwe dîtî , û çaxê li nav millet gerîha , û bi herdû çavê xwe dît bê ew di çî rewşa nexweş deye ji hêla zanistî , mewdanî ,û bi çavê xwe dît mijandina axa û mele û şêxa xwîna karker û cotkar û parîşana , vaqas tiştan dilê wî sotin , dilê wî xemgîn kirin , dilê wî mîna volkanê keliha gerim bû teqîya helbesit û çîrok û ziman , şoreş , berxwedan , zanîn bi ser kurdan de rijand .

Cegerxwîn di nivîsandinê xwede , û bêhtir di helbesta xwede doza welatekî azad jibo gellê kurd di xwest-welatekî her kes tede weke hev , welatekî bê cudatî di nav bera pîrek û mêrde , welatekî merov tede serbest ne sitemkar ne bin destî ne zor .

di helbesta xwede pir pesnê pîrekê daye , nazikbûna wê xweşikbûna wê lê timî wêneyê welat-li pişit wê pîreka xweşik û bedewbû yekî hew dizanîbû gelo ew ser pîrekê di bêjê yan jî ser welat di bêje , ez di bêjim hejêkirina ji herdûwanre ew wêneyê hûnandî çêdikir mîna hûnandina keziyê , ev ji hêlekêve, ji hêla din ve doza pêşketinê dikir û rêya pêşketinê bi zanîn ji millette dida xuyakirin : xwendin û zanist û dirav . Em çiqas bêjin û em binvîsin emê bi kêmatî bêjin û nivîsin li der xebat û karê nemir roja zimanê kurdî Cegerxwîn . lê di dawîde ez dixwazim du tiştan bêjim :

1-heger em bêjin quranê zimanê erebî parast , û Kemal etatorik zimanê tirkî hinekî paqijkir ji gotinên biyanî û tîpên wan wergirandin latînî , û heger em bêjin zimanê farisî hat paristin bi edebê wê yê kilasîk em karin bêjin bê şaşîti Cegerxwîne parêzvanê ji zimanê kurdîre .

2- em ji her kesê rewşenbîr , siyasetmedar , nivîskare di bêjin : pêwîste kû merov nivîsandinê Cegerxwîn xweşik bixwênê .

Pêwîste em Êzdî jî çarenûsa xwe

bihêz û rêxistbûna

endamên Êzdîtiyê diyar bikin.

Şikir ji Xwedê ra, min dît ku vê carê 23 mal û komelên Êzîdîyan jî bihev ra li dijî seredana serokwezîrê dewleta tirkîyê R. T. Erdogan û desthilatdariya hikumeta tirkîyê, ya ku netewîperestîya tirkan di ser ya her milletê de didenaskirin, tenê dîne îslamê heq dibîne û mafên nasnameya etnîkî, bawerî û rengên mirovên dinê jî kafir bi nav dike, derketin. Zahf bextiwar bûm ku, mal û komelên Êzîdîyan di helwestname xwe de hinek ji zilm û zora desthilatdariya hikumeta tirkîyê, bi gelek berpirsyarên partiyên ku di parlemontaya almaniya de, rêxistinên sivil, weqf, înstîtit, dêr û navendên olî, yê Xaçparêst, Cihu, Êzdî, Bisilman, Elewî û hwd. yê li almanya yê hene ne dahne kifşkirin. Binêren li, **“Daxwiyaniya mal û komeleyên êzîdîyan derbareyê gotara Erdogan a da wî de”**

Her weha ez zahf dilxweş bûm ku, hinek ji berpirsyarên mal û komelên me Êzîdîyan jî, di 31.10.12 de li bajarê Berlinê, tevî gelek demokrasîxwazên Kurd, Tirk, Alman û hwd, berpirsyarên civakên etnîkî û baweriyên ku di nava tirkîyê de hene, beşdarî meşa protestokarina seredana serokwezîrê dewleta tirkîyê R. T. Erdogan bûn.

Dilê min dixwast, ew Konferansa Êzîdîyan ya ku di navbera 16-17'ê cotmehê 2012 de, li Amedê bi pêşengîya **hinek** endamên Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û alîgirên BDP'ê, Federasyona Komeleyên Êzîdîyan (FKÊ), rewşenbîr, welatparêz, „olzahne“ û „lîderên ola Êzdîtiyê“ ve hate li darxistin jî, mîna vê helwest û daxwazname li dijî seredana serokwezîrê dewleta tirkîyê R. T. Erdogan, ya Almaniya û desthilatdariya hikumeta tirkîyê, bi alîkariya tevgerê olzahnên Êzîdîtiyê, yekîtiya rêvebirên mal û komelên Êzîdîyan bihata amede û niqaşkirin.

Bi dîtina min, armancên Konferansê ji bo nasîna Êzîdîtiyê pêşketî û naveroka bernama wê pir qels bû. Tevî vê xembariyê jî, ez serokê KCDê rêzdar Ehmed Turk, wan endamên Kongreya Civaka Demokratîk, alîgirên BDP'ê , hemû welatparêzên Kurd, dost û endamên civaka Êzîdîtiyê, yê ku ev Konferansa li paytexta bakurê Kurdistanê û ji bo nasîna Êzîdîtiyê amede kiribûn, spas dikim.

Hêvîdarim ku di serî de desthilatdarên dewleta tirkîyê û hevalbendên hikumeta tirkîyê- “demokratên Ewrûpayîyan“, her weha rewşenbîr, zahne, sazî, komel, dezgeh û rêxistinên partiyên Kurd(Êzdî)an, jî bikaribin, mîna ku serokê KCDê rêzdar Ehmed Turk gotî, “... Bav û kalên me li destê wan xwîna gelê êzîdî heye. Li eniya bav û kalên me morek reş heye. Em dixwazin hûn me bibexşînin.” *van* rastiyên dîrokî bivînin, bes me Êzîdîyan bi peyvên neqenc piçûk bikin, destên xwe ji qirkirina „kurdên resen“ û tahlûkên asîmlasiyonê bişon.

Ji xwe gelek ji we rêzdarên dizanin û ez jî di her êrîna xwe de dêjim, hêvîdarim ku tevayîya endam-rêvebirên mal û komelên me Êzîdîyan bizanibin, raste ku pêdiviya me Êzîdîyan bi zanistî, tecrûbe, pisportiya birayên Kurd û hwd. heye. Lê, divê em jî bikaribin weke her dîn, civakê, çarenûsa xwe bihêz û rêxistbûna endamên Êzîdîtiyê diyar bikin.

Ji Xwedê lave dikim ku, birakujîya di nava Kurdan de qet nemîne, hemu mafên civakên gelê Kurd, daxwazên girtî û kesên ku niha di grêva birçîbûnê de ne werine qebulkirin.

K.Tolan, Xemxwar û Berhevkarê kevneşopên Ezdahîtiyê.

Şêx Adî

nas bikin

Şêx Adî mirovekî bi keramet û xwedênas û zana û reformkarê ayîna êzdiyatîyê bûye. Ew di navbera salê 1073 û 1162'an de dijiyaye. Parastina Şêx Adî di nav hebandina êzdiyan gelek girîng e û roja îro gora wî li perestgeha Lalişê cihê ziyaretê ye.

Jinenîgarî

Li ser bûyîn û nijada Şêx Adî tiştên ji hev cuda tên gotin. Hinek dibêjin, Şêx Adî li Colemêrgê ji dayîk bûye, hinek jî dibêjin li Lubnanê. Bi gor cihê dayîkbûna wî jî, hinek dibêjin Şêx Adî kurd e, hinek jî wî ereb dihesîbînin. Dema dayîkbûna wî jî bi tevayî ne eşkereye. Lê bi gor piraniya nivîskaran û pêşkeftiyên Êzîdiyan, Şêx Adî di navbera salên 1073 û 1078 de, li gundekî Lubnana îro, li Beytfarê, li Deşta Bekaayê hatiye dinê. Navê bavê wî, Musafîr e. Bavê wî jî malbata Benî Umeyên Emewî ye ku ev malbat li Şama Suriyê dijîn. Bi vê nêrînê jî diyar e ku, Şêx Adî ereb e, lê tevayî jiyana xwe di nav kurdan de wek kurdekî êzîdî domandiye. Gora Şêx Adî, li mintiqayê Şêxan, di Geliyê Laleş de ye. Hemû Êzîdiyên cihanê, Geliyê Laleş, bi taybetî gora Şêx Adî tewaftî dikin û piştî tewaftê dibin hecî.



Perestgeha Lalişê ku tê de gora Şêx Adî ye



Gora Şêx Adî

Rola Şêx Adî di ola Êzîdîtiyê de

Êzîdîtî, ji alî gelek lêkolîneran ve, wekî dumahîka ola Zerdeştîyê tê dîtîn. Hin esasên di navbera her du olan de ne wek hev bin jî, tê zanîn ku ev esasana piştî Şêx Adî derketin holê. Şêx Adî, esasekî li pîle û îbadeta êzîdiyan danaye û ev esasên Şêx Adî hîn jî berdewam e. Lê dîrokê de tesîra herî mezin a li ser Êzîdiya, tesîra Şêx Adî ye. Şêx Adî, bi bîr û ray û raman, tu car negotiye ku "Ez Êzîdî me.". Lê tevayî Êzîdiyan bawerî bi Şêx Adî tînin, wî wek pêxemberê êzîdiyan dizanin; ruhê Melekê Tawûs di şexsiyeta

Şêx Adî de dibînin. Belgeyên nivîskî ku îro gêhîştîye destê lêkolîneran jî, pirtûkên Şêx Adî nin. Pirtûkên nivîskî ên êzîdiyan jî bi destê Şêx Adî hatine nivîsîn. Her du pirtûkên pîroz ên Êzîdiyan ku Şêx Adî nivîsandiye, dişibihin Zend-Avestaya Zerdeştîyan. Wekî tê zanîn du pirtûkên êzîdiyan hene: Yek ji wan Cilwe, ya din jî Mishefa Reş e. Orjînala Mishefa Reş, piştî koça Şêx Adî, di sala 1743'ê zayînî de hatiye dîtîn. Zimanê Mishefa Reş kurdî ye.

Jêder: Wikipedia kurdî

Newaf Miro

newafmiro@gmx.de

XWEKUJ YAN JÎ ŞEHÎD



Rojnamevanê ciwan Avda, dixwest serdana gora hevalê xwe, Celal ê xwekuj bike. Ku wî bi navê Şoreş, Celal dinasî. Avda ji serê sibê ve berê xwe dabû gundê ku Celal lê ji dayik bûbû. Gundêkê Marî. Ew gundê ku her gava Celal qalê dikir, li ber çavê wî dibû behîşt. Gava nêzîkî li gund dikir, her dengê hevalê wî, di guhê wî de dengvedida. Ew havalê rojên xwendinê, girtîgehê, yê çalakî û xebatê, yê rojên dijwar. Yê ku ew qas fedakar, û zehmetkêş, mirovên weke wî, Avda di jiyandê de nenasbûn. Dîmenê wî li ber çavê Avda zindî dibû. Ku wî jî nikarîbû mirina wî bipejiranda, di hizr û bîra wî de, ew her zindî bû. Gava nêzîkî gund bûbûn, bala xwe dida gund. Ew şox û şengiya gund nemabû. Ne êdî rez û werz. Ne jî keriyê miyan û bizina. Nema refê Bêrivan hebû, gava ew cil û bergên spî li xwe dikirin û didan pey hev. Weke ristika Qulingên li ezmên bûn. Yek ji ya din bedewtir bû, bi gotina; Celal. Dîmenê gund li ber çavê wî, weke kavilê pişt talanê mabe bû. Lê her ew li şopa lingê hevalê xwe û nîşanên wî digeriya. Demên berê, xelkê gundî, li derdorê gunda xwedî pez bûn û cotkarî dikirin. Lê li şûna wan îro dewletê çek dabû xelkê û cerdevanî bûbû karê sereke. Xelkê gundî êdî bi mûçeyê qorîcîtiyê, xwe xwedî dikirin. Li teniştê rê çav li gundiyeke ketibû. Avda dixwest jê bipirse ka mala Celal Kazma kîjan e. Gundî bi mirûzê tehl silava wî vegrandibû û jêre got:

- Haa waye diya wî terorîstê mirî. Wa dîsa berê xwe daye ser gora wî û ber bi goristanê ve diçe.

Avda bêyî ku tiştêkî çewt bêje, serê xwe hejandibû. Pêre jî, berê xwe ber bi gund ve kiribû û dabû ser şopa dayika Celal. Heta ew ghiştibû wê, diya Celal ghiştibû ser gorê. Serê xwe dabû ser kêliya Celal û gilî gazincên xwe dikirin, tevî hêsirê çava. Avda hatibû li pişt wê sekinîbû, û ne dixwest wê hişyar bike. Dîtibû ku dayika wî dengê xwe radike, wî jî ker lalîve, dengê wê girte kasetaya teybê ya di berika wî de. Wê jî çavê xwe girtibûn û digirya û digot:

“lawo lawo lawo, te çima weha kir. Te dilê dosta reş û yê neyara xweş kir. Te çî bi min kir lawo. Te çîkir û te çî nekir! Lê te dawîya dawî dilê min tije kul kir. Te meydan ji gur, mişk û rûviya re hişt û çû lawoo.. Te mala min şewitand û konê min jî ji nav kona rakir. Lawo lawo te çî bi serê xwe kir? Te

çî bi serê dayika xwe ya reben kir? Ka kî, wê ji min re wûsa bi şîranî bêje; dayê! Ka kî yê li halê min pîrse? Ka kî yê weke te jîr, bi kêr û bi xêr be? Ka kî, wê weke te, ji min re dilovan û dilpak e? Te ne dixwest tu car ji min re bibî bar. Heta te dixwest di girtîgehê de jî bi min re bibi alîkar. Axx xwezî bi rojên girtîgehê. Gava ez û xizmên girtîya dihiştin hev. Em giştik di yek halî de bûn. Bi hêviya dîtina we dilê me weke defê lê dida. Lê niha dilê min radiweste û dîsa lê dide lawoo. Te ew qas xwend û tu ew qas jîr û kêthatî bûyî. Lê çima, ew zanebûna te kêrî te nehat lawoo.. Te çima bi mirina xwe neyar şa kir? Te çima wûsa kir dayik rebenê lawoo.. Te herî zêde qedr dida peyva min. Te ji çîrok û stranê min hez dikir. Te ji ber dayik û bavê xwe şerm nedikir. Te ew qas tişt dizanîbû, mirov nikarîbû bawer bike. Çima ew bra û xwûşkên te yê totik vala xwe nakujin? Tu dizanî çî bûye? Brayê te Mendo, navê xwe kiriye Melle Mendûllah. Û paşnavê xwe jî guhertiya, ez fedî dikim wî navî bêjim... lê navê xwe kiriye; Hergun.. Ma nav nema navê tiştê xwe li xwe bike. Ji bo navê wî û yê te ne yek be. Lewma wûsa kiriye dibêjin. Ji xwe jî herga bûye melle, naxwaze silavê jî bide min. Ew jî ber kurd bûna xwe şerm dîke. Xweî li serê wî û wê cemahatê be, ku li dû wî nimêj dîke.. Yê din cerdevano, wî jî paşnavê xwe gurtiye, û kiriye: Mehmet Êker. Navê wî layiqê wî ye. Jixwe ne ji kerê çêtir e. Xwişka te Xanimê, ji kêliya bûye jina Hecî Pere. Nema silavê dide min. Dibêjin hecî gotiye; ger tu rojekê silavê bide wê diya terorîsta, êdî lingê te bi vê malê nebû. Wê hec û qedrê hecîtiya min were pênc pera.. Jixwe ew jî naxweze. Ya din Sêvê xatûn, ku niha bûye Sîpel, ji her gava bi wî mamostê gund yê tirk re çûye, nema silava xwedê jî dide min. Rojekê jî li halê min nepirsiye. Ew niha bûye jina tirka Sîbel xatûn.. Brayê te yê ku te jê hez dikir Kemal, çû Stenbolê û nema haya min jê ma. Nizanim sax e yan jî mirî ye.. Lê bi qasî hin hevalê wî, ji hina re gotiye. Ew bi keçeke romî re zewiciye. Jinikê qewla xwe pêre birîye ku tîkiliyê xwe ji kurda û malbat xwe qut bike. Hate guhê min, hin hevalê wî, silav jî danê, ewî bi tirkî bersiva wan vegeandiye û xwe li wan nekiriye xwedî. Li min û li vê rûşiyê. Mêrê ku nikaribe silava xwedê jî vegeîne.. axxx lawo te çî kir lawoo te xweliya van xirbeyan li serê min kir lawoo. Ewqas

pirtûk û pelikê te, di nav refikan de man lawoo.. te çima weha kir? Te çima? Çima, çima, çima weha kir lawoo.. Te terka heval û hogiran kir? Te terka Kurdistan ê û partiya xwe jî kir. Ew partiya te ji bo wê canê xwe dida û tu ne dimir. Ew hevalên te, ku te ji ronîya çavê xwe bêtir ji wan hez dikir. Te hevalê xwe di nav agir de hiştin û tu çuyî.

Te hevalê xwe li serê çiya hiştin û tu çuyî.. Te dayika xwe, kezêb şewitî hişt û tu çuyî lawoo.. Jixwe ji bona ez xwedî li te derketibûm, hemûya, belê hemû Xwûşk û Brayên te terka min kiribûn û kirin. Lê te? Te jî terka min kir! Çima? Ma mirov dikare vê xirabiye bi hezkiriyê xwe û doza xwe bike? lawo lawoo.. dayik rebana van çol û çiya wo lawoo.. Tiştê dijmina dixwest te, bi xwe û bi me kir lawoo... Ma ev çî bû? Ev çî ecêb û sosret bû..

Dayika Celal Medê, ketibû tayê. Xem û kulê wê tev rabûbûn û serê xwe ji erdê û ji ser kêliya gora bê deng û ji axa sar ranedikir. Xwe ji bîr kiribû. Bi tevdana xeman re xwe wenda kiribû. Û her dida hilobiyên û digiriya. Hêsirê wê diherikîn bi ser rûyê wê ve. Avda jî pêre digiriya. Bêdeng û his.. Gava dayika Medê serê xwe rakiribû reşê Avda bi ber çavê wê ketibû. Beriya serê xwe rake hêsirê xwe pakir. Gava serê xwe rakir û li xwe zivirî dîtibû, ku xortek di ser wê re sekiniye û ew jî weke wê xemgîne. Wê ew nas nekiribû. Got:

- Min hûn hasnekirin qurban..

- Ez jî weke kurê te Celal im. Ez hevalê wî me. Ka ez destê te maç bikim dayê..

- Na na xwedê te bihêle. Ji xwe derdora me tije mît û ît in. Nabe.. Xwe dîrî min bike. Ez nikarim li vî gundî, li te xwedî derkevim û te bi hewînim jî qurban. Tu dikarî herî bajêr ezê sibe werim komelê yan jî partiyê. Em dikarin li wir bi hev re biaxivin.. Tu herî ji vê deverê, ji bo me herdokan jî başe.. De here here bi rêya xwe ve ez qurbana te..

Avda destê xwe dabû kêliya hevalê xwe Celal û bi rêya xwe ve vegerya bû. Serê wî tije pîrsên bê bersiv bûbû. Lê herikandina hêsiya, can û barê wî siviktir kiribû..

Serhan Isa

serhanisa@hotmail.com

Pênûsa Min îro



Serhan Isa

BARANÊN BÊ PÊJIN

Baran,
barana ku min jê hez dikir
baran ya ku,
ji çîçikên daleqehayî dibariya
barana ku,
ji keskahiyê hez dikir,
baran ku,
ji kenarê Ezman tê,
baran ku pêjna Xwedê ye
baran ku evîna Azman e,
ew baran ku dibarî,
ew baran ku dihat,
ew baran ku diçû
baran, ew baranên me
baran ku,
dibin dawîtîrîn dilopa wê de
dimeşiyam
ji mêj de nema dibarin!?

Baran ya ku,
doh,
bû mêvana min
û evê helbestê
kaxezên ji pêjna baranê
û pênûsên kesk barandin
û ji nişkan ve bê pêjin bûn!?

baran ku
ji bo pêjnên wê
min cerehên vodka yê
bi zehir xwe dadikirin
îro xwe vedixun!

neferîn jê re
yê ku dibin çipeçipe te de rêwî bibe
bawer bike êdî
ne ba
û ne baran
û ne jî tu Azman
dikarin te şîrove bikin !.
Eger tu bibî sed ewir di ewrekî de
Tu keskahiyên min nema êdî şil dikî.
lê eger ez bûbame mistek baran
min ê tu kiribaya gulîstanek peyv û pêjin
û di hambêza xwe ya tev pêjna te,
bibarande.

Îro jî ez û rêhevala xwe êş,
ji bo rojên xwe yên mayîn,
te tenê pêjin dinivîsîn in.
Hetanî di xilmaşiyên de jî,
te dilop dilop,
ji derdorên xwe didin hev,
û êvarên xwe,
ji te bê pêjin dikin.

Xwezî em di xwe de bimane,
xwezî em di baranan de bimane,
xwezî em di xwe de bibûne rêwî,
xwezî me tenê xwe pêjin û pêjin bigotaya,
xwezî min karîbe,
te ji wisa bêtir,
bidêr im, bidêr im û bidêr im.....
û di ber serê peyvekê de,
pêjneke ne têr pêjin bigotaye.

Hêdî hêdî, hêmin bibe,
daku ez te yê mayî jî bêjim,
daku ez xwe yê mayî ji te verês im....vehesîn
im,
daku ez xwe ji xwe û ji pêjnên we,
ji pencereyên we yên bê ewle û pîrr pîrs,
ji pêjinên we yên ji qulpan hartir,
ji vodka yên we bidizim.

“Hêdî bajo li me fermane
Giran bajo li me fermane”
daku ez ciyan fêrî nebeşdariya we bikim.

Hêdî hêdî,
ez nema pêjinên xwe,
di ceyografiya şevên we de,
dibim eşkerekirinê.

Şevên we
pîrr pêjn in
pîrr har in
pîrr sar in
pîrr soz in
pîrr Xwedayên mezin û kesk in.
û ez ji Xwedayên we hez nakim,
tenê ji peyvên we yên kesk hez dikim.

Ez tenê nalîna peyvê bûm,
ez tenê cerih û cerih,
vodka û vodka
pêjin û pêjin
heval û heval
hêmin û bijwên
dihatim pêjnên we.

Dema te û wan,
pêjin di pencereyan re,
radigirin şevîniyan,
wê çaxê,
ez û pêjnên xwe,
ji zozanan dihatin,
wê çaxê,
ez pêjin dibariyam.
Hêdî hêdî
daku tu fêrî pêjnan bibî.

Baran,
Baran ku ditirsiyam,
ku carekê bibare,
û tu ne bi min re be,
baran ku pê dijîyam,
baran ku dibû baran,
ji zivistanê jî neditirsiyam,
ji fîre fîra bayê jî neditirsiyam.

Nuha,
bê baran dijîm
nuha,
bê zivistan dijîm
nuha,
li her derî tenê kwîte kwîta bayê ye
nuha,
bê zozan, bê gemyan, bê zivistan, bê buhar
dijîm
nuha tenê ez ,
û rêhevalên xwe
êş û payîz,
tenê pêjin hevûdin dibêjin.
Nuha tu jî
tenê baraneke bê pêjin î
baranekî ku ji şilahiye ziwa diçû şilahiye
barana ku tenê xwe şil dikî.

Lê di pêjin û bejna wê peyvê de
tê her û her bimîne pêjneka şil
dê her û her
li bendî keskên te yên nezayî
baran û pêjin bimîn im.



- Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd-Sûriyê
- Komela Nûbihar - Essen Almanya



Roja Helbesta Kurdî

Roja Helbesta Kurdî li derve 2012, pêkhat

Me wek Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê û bi alîkariya Kolela Nûbihar li Essen(Elmanya) roja helbesta kurdî li derve pîroz kir.

Piştî ku me roja helbestê pîroz kir, nivîsa li jêr hate weşandin.

Roja Helbesta Kurdî li derve 2012, pêkhat

Do 14.10.2012an li bajarê ESSEN-Elmanya Roja Helbesta Kurdî li derve 2012 li dark et.

Hezkerên helbestê ji gelek gelek deveran amade bibûn, û li helbestê guhdarî kirin.

Jimarek mezin ji helbestvanan amade bûn û helbestên xwe xwendin. Ji wan; **Alwan Şivan, Can Kurd, Ciwan Qado, Dr. Husên Hebeş, Henîf Yûsiv, Hoşeng Osê, Hesên Îrandost, Necîb, Jan Dost, Keça Kurd, Mizgîn Hesko, Nesrîn Ehmed, Newaf Mîro, Nûh Silêman, Serhan Îsa.**

Gotina Roja Helbesta Kurdî li derve 2012 ji aliyê nivîskar Qado Şêrîn ve hate xwendin.(Gotin li dawîya evê nûçeyê ye).

Her wiha hunermendê deng xweş Zubêr Salih jî amade bû û du stranên xweş pêşkêşî cemaweran kir.

Nivîskar û lêkolînerê kurd Jan Dost ji aliyê komîta birêvebir ve hate xelat kirin, xelat ji aliyê hunermenda kurd Evîna Welat boyî Jan Dost hate pêşkêş kirin.

Bi çalakîyê re du pêşengeh hatibûne li dar xistin. Du şêwekarên jin ên navdar Cîhan Brahîm û Jengîman Omer bi tabloyên xwe dîwarên Bi çalakîyê re du pêşengeh hatibûne li dar xistin. Du şêwekarên jin ên navdar Cîhan Brahîm û Jengîman Omer bi tabloyên xwe dîwarên keheha çalakîyê xemilandibûn.

Roja Helbesta Kurdî li derve 2012an ji aliyê şêwekar û çalakvan Inayat Dîko ve hate pêşkêşkirin.

Roja Helbesta Kurdî li derve 2012 ji aliyê Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li derve û Komela Nûbihar li Essen, amade û hate birêvebirin.

Têbînî: di nêzîktirîn wext de, malpera www.mediakurd.com vîdyoya tevaya roja helbestê diweşîne, li bende bin.

Komîta amadekar a Roja Helbesta Kurdî li derve 2012an.

Essen-Elmanya

Wêne-album;

<https://picasaweb.google.com/113265104181493595914/RojaHelbestaKurdLiDerve2012#>

Komîta amadekar

Essen-Elmanya

Gotina komîta amadekar

Di roja çalakîyê de nivîskar **Qado Şêrîn** gotina komîta amadekar xwend, ev jî têksta wê ye:

Mêvanên roja helbesta kurdî,

Xûşk û birayên hêja,

helbestavan, nivîskar, hunermend, siyasetmedar û rewşebîrên birêz,

Bi navê komîta amadekar a Roja Helbesta Kurdî li derve, em bi xêr hatina we dikin, û dibêjin:” hûn li ser seran û çavan hatin”.

Gelî rêzdaran,

Di salên borî de sê ciwanik û ciwamêran Roja Helbesta Kurdî li derve amade dikirin, û li gel hezkerên helbesta kurdî pîroz dikirin, îsal me wek Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê ev roja pîroz wek erkeki netewî û çandî girt ser milê xwe û li gel we hêjayan pîroz dikin. Bi vê bihaneyê em spasîyek germ pêşkêşî komîta sala par (Keça Kurd, Elî Cefer û Helîm Yûsiv) dikin , û ji wan re dibêjin: spas ji bo we, spas ji bo keda we, her şad û li pêş bin.

Roja Helbesta Kurdî çalakîyek salane ye, ji sala 1993an ve li Rojavayê Kurdistanê tê pîroz kirin, daku roja koçkirina helbestvanê nemir Cegerxwîn 22. 10 an, destnîşan bikin û di wijdanê me de zindî bimîne. Bi pîrozkirina salane re Cigerxwîn tê vejandin û helbest digurnije, her wiha xelatek giranbûha bi qama helbesta kurdî vedibe.

Mêvanên birêz,

Dema em vê rojê bi bîr tînin, mebest jê ew e, ku helbesta li seranserî dîroka me, zimanê me yê şêrîn parastîye, bilind bikin û nixê wê yê pîroz bidîne, jixwe helbestvanên me bi kêmanî salê carekê di vê rojê de hevdu dibînin, helbestên xwe ji xwe û me re dixwînin. Herwiha armancek din jî li lidarxistina vê rojê heye, ew jî ew e; ku helbesta hemû helbestvanên xwe yê nemir mîna: Ehmedê Xanî û Nalî, Melayê Cizîrî û Hejar, Cegerxwîn û Dildar, mîna Ehmedê Xanî û Nalî, Melayê Cizîrî û Hejar, Cegerxwîn û Dildar, Osman Sebrî û Ebdula Goran, Tîrêj û Qadir Koyî, Feqê Teyran û Herîrî, Qedrîcan û Pîremêr û gelekên din bivejînin û ji giyanê wan re bêjin: hûn mîna helbesta xwe zindî ne, hûn di wijdanê me de dijîn, hûnê qambilind bimînin.

Hêjano,

Em û we vê rojê bi hev re pîroz dikin û welatê me Sûriyê bi giştî û rojavayê Kurdistanê bi taybetî di qonaxek dîrokî re derbas dibe, ji 15ê Adara sala borî 2011an ve şoreşa gelêrî li dijî rêjîma sitemkar û xwîrêj berdewam e, rojane bi dehên şehîdan bi destê hêzên Esed û Şebîheyên wî tene kuştin, gelek ji wan jin û zarok in, wexta firokeyên Esed ên şer bemîlên barûdê bi ser serê wan de berdidin, gelek ji wan tene kuştin û şehîd dibin, gund û bajar wêran dibin. Lê, tevaya gelên Sûriyê di wê baweriyê de ne ku şoreş biserdikeve û rêjîma Esed wê birûxe û azadî bê welat û herêma me.

Bi vê bihaneyê em ji tevgera xwe, çalakvan û hevrêzên xortan dixwazin, ku rêza xwe bi yek in, helwest û gotara xwe bi yek in û di asta şoreşê de bin, her wiha ji wan dixwazin ku berjewendiyên gelê kurd bidin pêş û bixwazin, ne ku bi dû berjewendiyên xwe yê kesane û partayetî de biçin, eger wiha nekin ewê gelê kurd wan efû neke, çimkî berpirsiyerek dîrokî ye û ji we hemiyarî tê xwestin ku hûn xwedî li mafên gelê kurd derkevin, eger hûn wisa nekin, hûnê berpirsiyar û rûreş bin di ber bidestnexistina mafên gelê kurd de.

Li dawî, bi hêviya ku sala bê Sûriyê bê rêjîma Esed be, azad û demuqrat be, daku em vê roja

pîroz li ser xaka xwe ya pîroz, li welatê xwe di bin siya azadiyê de bi hev re pîroz bikin, li welatê

azad, li welatê bê Essed û rêjîma wî ya diktator pîroz bikin, ku kurd jî tede gihabin mafên xwe yê

rewa, û Sûriyê bûbe demuqrat û hevbeş, hemû kes tede azad û wek hev bijîn, bê tirs û bê

binpêkirina mafên mirovan.

Dubare hûn bi xêr û xweşî hatin..

Komîta amadekar

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê

Komela Nûbihar Essen-Elmanya

Berî rojên çalakiyê me gelek agahî weşandin, daku em xelkên xwe û hezkerên helbestê agahdar bikin, û daku bên em hemû bi hev re li helbestê guhdarî bikin. Ji wan agahiyên:

“Roj Helbesta Kurdî li derve 2012, lidardikeve

Ji sala 1993 an ve, her sal, di roja koçkirina seydayê Cegerxwînê nemir de, li rojavayê Kurdistanê, roja helbesta kurdî tê pîroz kirin û lidarxistin. Herwiha li derveyê welêt, li Elmanyayê jî tê pîroz kirin û helbestên xwendin.

Di roja lidarxistina Roja Helbesta Kurdî li derve ya sala borî 2011an de ku li bajarê Essen-Elmanya lidarxistibû, nûnerê Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî pêşniyar kiribû ku ji ana û bi şûn ve Roja Helbesta Kurdî li derve bigrin ser xwe. Vêga em H.N.R.K.S xwedî li soza xwe derdikevin û di cotmeha îsal 2012an de li Essen-Elmanya Roja Helbesta Kurdî li dar dixin. Herwiha me gotibû: bi hêviya ku sala bê em Roja helbesta Kurdî li welêt, li Nebî Horî pîroz bikin, lê mixabin ew hêvî pêk nehat, hêvî di mîne hêvî û namire.

Emê di nêzîktirîn wext de dest bi name û vexwendinê bikin, emê hewl bidin ku ne tenê helbestvanan amade bikin, daku helbestan bixwînin, her wisa ji her kesî hêvî dikin ku li vê roja dîrokî amade bibin û li helbesta xwe ya kurdî guhdarî bikin. Her wisa emê di nêzîktirîn wext de hemû agahdariyan, cih, kat, roj û navîşana roja helbestê biweşînin. Herwiha, emê hewl bidin ku ji bo rengînkirina wê rojê hin hunermendên şêwekar amade bikin daku dîwarên holê bi tabloyên xwe bixemilînin, jixwe wê ew roj bê muzîk û strana kurdî jî derbas nebe.

Em wek Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî spasîyek germ û helbestiyane pêşkêşî Komîta amadekar ya „Roj helbesta kurdî li derve " ya sala borî ku ji van her sê rêzdarên pêkhatibû: Keça Kurd, Helîm Yûsiv û Elî Cefer dikin, û ji wan re dibêjin: we erkê xwe yê kurperwer di ber helbesta kurdî de spehî, baş û pîroz pêkanî. Mala we ava û her li pêş bin.

Li dawî, em bi kêf xweşî mizgîniya lidarxistina Roja Helbesta Kurdî li Elmanya di meha cotmehê de radişînin, û dibêjin li bende agahiyên nû bin.


Zimanê me, hebûna me ye.

helbest2012@gmail.com

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî””

Her wiha me nameya li jêr wek nameya vexwendinê ji gelek helbestvanan re hinart, li jor me diyar kir bê kî amade bûbû, hin jî nikarîbûn amade bibin û lêborîn xwestin, hinan jî name û vexwendin piştguhkirin, ne amade bûn û ne jî lêborîn xwestin.

Me nameya li jêr taybet bi navê her helbestvanekî şandibû. Ew jî ev bûn: Abas Abas, Alwan Şivan, Arşevê Oskan, Azer Şiwêş, Can Kurd, Ciwan Qado, Dîlan Zêbû, Dilyar Dêrikî, Dr. Husên Hebeş, Ebdilqadir Mûsa, Ehmed Huseynî, Gulîstan Haco, Henîf Yûsiv, Hêmen Kurdaşî, Hoşeng Broka, Hoşeng Osê, Husên M. Hebeş, Jan Dost, Kawa Şêxê, Keça Kurd, Merwan Elî, Merwan osman, Mizgîn Hesko, Nesrîn Ehmed, Newaf Mîro, Nezîr Melle, Nezîr palo, Nûh Silêman, Selîm Biçûk, Serhan Îsa, Tengezar Marînî, Xebat Şakir.



Roja helbesta Kurdî li derve 2012 Vexwendin

Helbestvanê hêja:

Silav û rêz,

Ji sala 1993 an ve, her sal, di roja koçkirina seydayê Cegerxwînê nemir de, li rojavayê Kurdistanê, roja helbesta kurdî tê pîroz kirin û lidarxistin. Herwiha li derveyê welêt, bi taybetî li Elmanyayê jî tê pîroz kirin û helbestên xwendin.

Ji ber ku helbestê ta astek bilind zimanê me parastiye, û ji ber ku 'Zimanê me, hebûna me ye', em Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî û Komela Nûbihar li Essenê we vexwendî helbest-xwendinê di roja helbesta kurdî de, dikin.

- Hêvî û daxwaza me ew e ku hûnê cihê xwe yê pîroz di vê roja pîroz de bigrin û rojê bi xwendina helbestên xwe dewlemend bikin.
- Her wiha hêvî û daxwaza me ji we ew e ku hûnê berî 01ê cotmehê bersiva vexwendina me bidin û me agahdar bikin, eger hûnê beşdar bibin an na.
- Her helbestvan dikare ta 10 deqeyan helbestan bixwîne.
- Xwezî hûn 3 ta 5 rêzan wek danasîna jiyana xwe bi bersivê re bişînin.

Katjimêr: 13.00

Roj: 14.10.2012

Cih: Maschinenhaus essen, Wilhelm-Nieswandt-Allee 100, 45326 Essen-Altenessen(Deutschland)

Têl: +491725245901, +491797313549, 015204594308

Berî roja helbestê bi wextek baş, me bi du zimanan, kurdî û erebî nûçe di medyaya kurdî de weşand û xelkên xwe agahdar kir ku roja helbesta kurdî li derve li dar dikeve. Ev jî têksta wê ye:

Vexwendin: roja helbesta kurdî li derve 2012

Werin em li helbestê guhdarî bikin, helbest giyanê me ye, giyan zimanê me ye, zimanê me, hebûna me ye. Êdî werin em bi hev re Roja Helbesta Kurdî pîroz bikin.

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî û Komela Nûbihar li Essenê we vexwendî Roja Helbesta Kurdî li derve dikin û dibêjin: werin em bi hev re li helbestê guhdarî bikin.

Roja Helbesta Kurdî li derve, ya ku ji sala 1993an ve, di roja wefata Cegerxwînê nemir de li rojavayê Kurdistanê tê pîroz kirin, îsal li bajarê ESSEN-Elmanyayê pîroz dibe. Vexwendin vekirye û her kes dikare amade bibe.

Roj: 14.10.2012

Katjimêr: 13.00

Cih: Maschinenhaus essen,

Wilhelm-Nieswandt-Allee 100, 45326 Essen-Altenessen(Deutschland)

Têl: +491725245901, +491797313549, 015204594308

helbest2012@gmail.com

Komîta Amadekar a Roja Helbesta Kurdî li derve 2012an.

Foto alboma Roja helbestê:

<https://picasaweb.google.com/113265104181493595914/RojaHelbestaKurdiLiDerve2012#>



BURCA BELEK



Mîr Behrem Gur ... Kurdên sasanî ... Berî 2300-2500 Sal



Gulavek Ji Zêr û Zîve...Kurdên sasanî
Berî 2300-2500 Sal

BONIYE - SUAD CEGERXWÎN

Koçkirina bavê min



Şevêkî şeva, ji çirya pêşî
Ewrekî giran l' kurdan hilkêşî

Stêrkeke bilind , j' ezmana, xuşî
gerdûn tarî kir , qitrana û reşî

ez li malê bûm, d' xewneke şêrîn
Dengekî bi jan, hat qîr û girîn

Dengê Azad bû, li tîlefona min
Saxbe serê te , êdî xuşka min

Xoşbe herdemî , tevî zarên xwe
Hew tu bibînî, derd û kulên xwe

Rabe xuşka min, tu were ba me
Gel me tevan be , parke kulên me

Min qîr kir û go: Ne bavê min be
Go bê sûdaye, zûke gel me be

Ber xwe min nedî, hew çavan nerî
Çûm mala bavo, ber devê derî

Bavê mey şêrîn, nazik û çeleng
Ser cihê xwe bû , laşekî bêdeng

Çawa min ew dît, bê deng û ronî
Xanî min şarand şîn û hem şonî

Çawa ev gernasê bi nav û deng
J' nav me zû barkê bê şer û bê ceng

Min ji nû ve got: bavê min va çû
Xewa dawî ye, hew radibê, nû

Min xwe avêt ser, laşê hîna germ
Qîr û hewar kir, bê fedî û şerm

Her min lê d' nerî, min dida girî
Gel dayka xwe û xuşka Gulperî

Kî çi dibêje, deng qet nayê min
Tenê dibêjim , zû çû bavê min

Ey delal, bavo , ey dost û heval
Koçberî tu çû , b' axîn û mital

Armanca te bû, çûna Kurdistan
B' saxî tu ne çû , ta ku çû rewan

Lê me laşê te aniye welat
L' bejna Qamişlo, tu kirî xelat

Em soz didin te, ey bavê şêrîn
Qet winda nakin navê Cegerxwîn

Emê her û her, serbilind bijîn
Berhemê dara çandî nûvejîn

Ked û sermiyan bonî nemerdan
Xurcezîna zêr nava me kurdan

1985 o2 o3 Stockholm

Celal Muhammed Emîn



Hozanê Dilzar

Þênckirina helbesteke Bateyî

Şev li min şîn û girîne dil hewara min nehat
Bexçeyê bêgul nemîne gul bi xara min nehat
Wek heve jîne ne jîne ger buhara min nehat
Mam di qeyda derd û daxan xemguzara min nehat

Subhenabit vê şevê dengê menara min nehat
Keybera destê te yare dil wisader kir ji ten

Sed ji salan bendewarî hêviye şahî û ken
Ez tenê derdan dikêşim gulperestê bê semen
Munisê derd û xemanim sakinê beytulhezen

Tar û marim întîzarim şehsiwara min nehat
Sotiyê mûma te dilbedê bisojim dem bi dem
Dûriya cama te gul be dê bizik ve bême cem

Ger cihoka van xeman bîdê bibim derya kexem
Mamede karê me bit înnafetehna subhûdem

Wer nesotin atêşê dil şehreyara min nehat
Dêvexwim da kupeya lê mest bibe bişkê j
xweber

Da kuperçên wê peyalê serdilek nû bîne der


Wek du mestan bin ji işqê kes nebe dîwane ser

Bilfuraqî lîltelaqîbêsikûnim ta seher

Xane noşim bae zîzim Şengedara min nehat

Lewend Dalîni

DU HELBESTÊN EVÎNÎ



1. Mêkewa Min

Çi cara ku
Çavên dîlberê diketin,
Ber nîşana Tifinga
Min!
Dilê Min
Kor dibû!!!!????

Û çi cara dilê dîlberê
Di kete ber qefta
Rima min!
Rim
Kuh dibû!??

Çi cara
Mêkewa dilê yarê
Di ser davên min re
Dibûrî!
Kewê Minî ribat,
Lal dibû!??

Û çi cara refê,
kevokên wê
Di peravên min re
Difirîn!
Nêçîrvan
Di xew de dima !???

Çi cara memikên yarê
Di kefa mista min de,
Diketin lûs!
Jiyan ji şîr vedibû!?

Pêpelûkên sawîrê wê,
Çi cara di qûnaxên
Bêdengiya
Dilê min re dibûrîn!

Saz kok dibû!
Kok şîr dibû!??

Û çi cara,
Bayê bêhna
Dêmen dîlberê
Di hingivî
Canê Min
Tayên Minî hişk
Kat didan !?

Lê dema meya herdû lêvên wê
Mênakê min;
Serxweş dikir????
Ramûsan bi min şêrîn dibûn;
Û di Laleş û tekîyên
Zeradeştîyan
De Em herdû
Hembêzdibûn!!!!????

**2. Dilê rêwingî negihişte
lêvên te?**

Dilê min di rêwingî ya xwe de,
Ji rêwingiya çemekî,
Dûrtir çûbû?
Ji beza Xezaleke zozana,
Xurtir çûbû?
Ji kûrbûna bireke neftê,
Zêdetir çûbû?
Ji rêstina Sîmrekî li asîmanê hefta,
Ferehtir bûbû?
Lê;
Nîkarî bû bighêje,
Sînorê;
Dilê te,
Û
Ramûsanekê,
Ji lêvên te!?

F. Yakoub

TU WÎ



Tu wî xunav av û gulav
Li ser dara min belav
Pelek zer ez hatim xwar
Bê ba ji dara hejar
Tu wî perek ewrê spî
Li asmanê sayî bê piştî
Tu wî rojên behîştê
Di jiyana min da ne gehîştî
Tu wî xewna şevên sar
Bibîn ma te çi hiştî
Ev dilê birîndar
Ji kul û xema te kuştî
Tu wî derya pêl giran
Li ber pêlan ez hiştî
Pêlek har ser min da hat
Li ber xwe birî keştî
Tu wî jiyana û giştî
Li te her dikim geştî
Berdêl
Keştî : gemî
Geşt : ger

M.Şerîf Birhik

Şoreşe şoreş



Bese binerîn û raman
Bese bi siyaset û pîlan
Dest bidin çekê giran
Şoreşe şoreş
Bera ojdan bi vejîne
Bihna xwînê nêzîk dibê
Xwîna me sar dimeşê
Şoreşe şoreş
Xortê me şoreşgerin
Tev qehreman û mêrin
Ji meydanê ne vegerin
Şoreşe şoreş
Go me nebê kar û bar
Emê mênin bin dest û jar
Bese sed qîr û hewar
Şoreşe şoreş

Helbestvan

Hat girêdan destê ava dike jînê
 Hat girêdan çavê tim ronî dibînê
 Hat girêdan devê rastî dipeyvînê
 Hat girêdan dilê tim xwestî evînê
 Hat girêdan riya diçe ferehînê
 Rê venebû
 Rê venebû
 Ezê bêjim
 Hûn azadin
 Guh li min bikin yan guh nadin
 Hûn azad in
 Dayika delal çawa pêçeka xwe nade
 Ava zelal çawa ew giravê nade
 Yê hes dike çawa evînê bernade
 Yê zerdeştî çawa riya mezd bernade
 Weke ronî çawa rokê ew bernade
 Çawa befir serê çiyakê min bernade
 Hîna bêtir
 Hîna bêtir
 Milletê min welatê xwe ew bernade
 Ew bernade
 Heşkere ye
 Ne'bdizî ye
 Heşkere ye
 Çi pê bikin bêfêde ye
 Paşyawîna li vir heye
 Hebûna wî li vir heye
 Nexwe çima peşmerge ye
 Zehmet kêşe peşmerge ye
 Ew çavdarê rêka xwe ye
 Ew çavdare û nareve

Hat girêdan û venebû
 Dest venebû dizincîr ma
 Çav venebû kor tarî ma
 Dev venebû girt û lal ma
 Ling venebû mîna dar ma
 Dil venebû bi kula yar ma
 Sed ezdehak bive neve
 Wî bikujin roj û şeve
 Rojek wê bê û serkeve
 Rojek wê bê
 Ê bîna wî wê were ber
 Rojek wê bê
 Hişê wîna wê were ser
 Rojek wê bê
 Li welat rûne bisekne ger
 Rojek wê bê
 Tukes nema wî dike der
 Rojek wê bê
 Ji parçebûnre wê bêje her
 Rojek wê bê
 Bi ala rengîn bibin yek ser

PÎRÊ KAL**Ehmed mustefa****DEM Û EVÎN**

Dema min tu naskir
 te evîna dilê min şa kir
 Dema min tu naskir
 te jîyan li min geş kir
 Dema min tu naskir
 êş û alemên xwe min ji bîr kir
 Dema min tu naskir
 te keşwarê evînên li min peyda kir
 dema min tu naskir
 te dînya bimin xweş kir
 Dema min tu naskir
 min zayîna xwe ji bîr kir
 Dema min tu naskir
 navê kurdistan min li te kir
 ...
 kengî dil wê razê ...ey dilo dilê min
 dilê min bi hesreta xwenekî giran mayî
 ji xwe şevan direvê
 li ber destê sibehê nîv xewn dimînê
 lê kengî dil wê razê
 ey dilo dilê min
 û ev çend sal in bê xewn mayî
 ev demek dîr û dirêj dîsa bê xewn mayî
 dixwazê henkî kut kuta wê kim bibê
 yan jî tîr xewn bibê
 ey dilo dilê min

 nema dixwazê bê hêvî bimîne
 ey dilo dilê min

 ma tu kengî ji xwe direvî
 ma îro tu dixwazê ji laş min derkevî
 û tu niha dixwazê ez bê teniha jî bimînim
 ey dilo dilê min

 ma tu niha êş û azarên min dibînî
 piştî tu here ma çawa ezê bi teniha bêjim
 ey dilo dilê min



 ma îro tu dibînî
 te tiştê ji hez dikir
 li ber çavên te wêran kirin
 ma îro çawa ezê bi teniha bêjim
 û jiyana xwe nîvkuştî berde am bikim
 ey dilo dilê min

 ma îro tu dibînî
 li welat me

 navê te wendakirin
 te ji min re digot
 ev bêrîvan e

 û eva evîn e
 û ev jî cîhanê
 tê bîra te
 ev keçên van delal
 ey dilo dilê min

1
 Rojek sibê bilbilek
 Got bi xicavek bilind
 Ji nûtî û nûkirinê
 Ji baxek ava û rind
 Got: ji îro bi hev ra
 Fikir kin û telaş kin
 Wî baxa nûtir bikin
 Mala xwe rind û baş kin
 Xwendina wî mîna bê
 Li asimîn bela bû
 Bi gutina wî her kes
 Ber bi rêyek cuda çû



2
 Çûçik çûn û beref bûn
 Li ser darek bi hev ra
 Ew fikirîn ku îro
 Çi kin karek bi hev ra
 Ji beyna wan çûçikek
 Gut ji mirazê dilan
 Nazikya me kim nîne
 Ji serçan û bilbilan
 Ta nebûnî bilbilek
 Dengê me pirr kûtî ye
 Bixwînî mîna wan
 Ew sa me ra nûtî ye



3
 Qirik çûn û li kuncêk
 Perêne xwe kur kirin
 Çavê xwe xemilandin
 Nîniki xwe sor kirin
 Peyda kirin li erdê
 Wan qumaşek pirr rizî
 Mîna kiras û şîlwar
 Li xwe kirin bi dizî
 Dikenîn û digotin:
 Kî gutye girik reş e?
 Perê me bû keskesor
 Wa nûtîya pirr xweş e

Yehya Elawî Ferd

Eva Nûtî Ye


Helbestek Li barey Nûtî û Nûkirinê
Helbestvan : Yehya Elawî Ferd



4
 Serçe digot : li ser çî
 Hinik cînarê me ne
 Vira mane bi şûn da
 Ji me nûtir pirr he ne
 Gere îro ez herim
 Gere li vir nemînim
 Herim li nav baxek din
 Zû hîlnek bibînim
 Nûtî sa wî haka bû
 Firrî û çû baxek din
 Dil bi tenê, çav liri
 Dirrije histirê min



5
 Darkutikek li nav bêx
 Dar dikuta pirr caran
 Ta verkeve xwarinek
 Ji kurmê ortî daran
 Got : va ye nûtîya min
 Ku ez karek nû bikem
 Kurmê daran zirav in
 Gere herim mar bixwem
 Bi dizî çû ber bi mêr
 Mar halî bû radû kir
 Jî kir perê darkutik
 Êr û bî avirû kir
 Ji hevalê wî her kes
 Dipirsî ku : va çî yi?
 Tamil nekir bilind got :
 Va jî cûrek nûtî ye



6

Şev daket û qenarî
Fikir kir û çav vekir
Çû kunfirnsek rixist
Sa wan karek teze kir
Ji xwarin û vexwarin
Sa kunfiransi birin
Zû xwarin û dawî ra
Ji nûtîyê gep kirin
Li wî şeva qenarî
Gut : dizanim nizandin
Nûtî karek dişxar e
Hûn jî hîna xizan in
Gere dîsa bi hevra
Beref bibin li cem min
Ta fam bikin nûtîyê
Li kunfiransên din



7

Şev çû û hat rojek din
Bilbilê bang kir bilind
Got bi dilek nagiran :
Li min guh dagirin rind
Pirr nagiranim ku we
Çima karek haka kir
Çima li nûtî her kes
Riçûya xwe cuda kir
Nûtî yani bizanin
Dema xwe û şûna xwe
Yanê bi hev ra bibin
Li mayîn û çûna xwe
Bi xwendina bilbilê
Ew ji xewek reş ra bûn
Fikir kirin, bi hev ra
Aram aram ji vir çûn



8

Yeko yeko beref bûn
Qilîrê daran birin
Hatîn bi hev ra yek bûn
Baxê xwe nûtir kirin
Ew hatine nas kirin
Ew baxa bû baxek gir
Ji nûtîyê û nû kirinê
Sa baxê din xelat bir
Kesek hat û xeber da
Ku bilbilê gotîye
Ez dixwazim bibîjim
Îsal sala nûtîyê ye !



Jiyana Yehya Elewî Ferd

Yehya Elewî Ferd yek ji helbestvan, rojnameger û nivîskarên kurdên kurmanç e li Îranê ye. Di sala 1973yan de, li gundê Bawîgê a ku li ser Bezanê li parêzgeha Xorasanê Bakur li Îranê jî dayik bûye. Ev 20 sal in helbestên zaxan û niçwanan bi çar zimanê: Kurdîya kurmançî û farisî û erebî û inglîzî dinivîse. Wî heftê 10 salan helbestan li Îranê hilgirtîye. Ew niha li bajêr Qandîyan dîka. Heta nika heftê deş pirtûkên wî li Îranê, Inglîstanê, Iraqê û Tacîkîstanê hatine çap kirin.

Pirtûkên Yehya Elewî Ferd

Demaş Balkaş inî Farsi | 2005

Bihara bêdewî | Farsi | 2006

Eva nûtî ye | Farsi | 2008

Eva nûtî ye | Erebî | 2009

Wure bîlîne | Farsi | 2010

Wure bîlîne | Erebî | 2010

Mahemmed dîsa lê | Farsi | 2010

Sêrê Çelîkan | Farsi | 2010

Xwedê ku Her esj Çeng Bê | Farsi | 2010

Rojêk Dûmoqnekekê | Farsi | 2011

Mîna Bûkan | Farsi | 2011

Eva nûtî ye | Inglîzî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Eva nûtî ye | Kurdîya Kurmançî | 2012

Têbînî: Berî 5 salan ev pirtûk bi zimanê farisî hatiye nivîsandin, helbestek bilind e û pirrtir ji 5 xelatên mezin li Îranê hilgirtîye. Evê pirtûka bi navê "Eva Nûtî ye" heta niha bi zimanên Inglîzî, Erebî, Tacîkî û Ispanyûlî hatiye wergerandin. Nivîskar destpê kir ku ewê helbestê bi zimanê kurdî binivîsîne, wî ew nivîsî û ji me "Pênûsa Nû" re şand daku em biweşînin. Wekî din jî wî ew helbest kirye pirtûkek. Em wê pirtûkê bi wan wênayan diweşînin.

Ebdussemed Mahmud

RÊBAZÊN WÊJYÎ DI HELBESTA KURDÎ



Xeleka 1

Berî ku em dest bi vê lêkolînê bikin, divê em bersiva vê pirsê jêrîn bidin:

Ma gelo rêbazên wêjeyî yên ji hev cuda di helbesta kurdî de hene?. Teqz, wê bersiv erê be, ji ber ku navnîşana vê lêkolînê rêbazên wêjeyî ye, em dibêjin nivîsandina di rêbazekî de normale, lê ta kîjan astê jê re perwere, ev problême, ji ber gelek sedeman, ez qelsiyê di rêbaza kurdî de dibînim :

1-helbesta kurdî hindike, jimarê helbesta tede kême ne pir e, ku em karibin bi hesanî wî cuda bikin beş bi beş rêbaza, ji ber ku dîroka helbesta kurdî li sûriyê nûye, em dikarin bêtir ew bi rengekî eşkere ji Cigerxwîn dest pêdike, tevî ku ji bilî wî jî hebûn, lê Cigerxwîn nûnerê herî xurt yê ku di damezirandina helbesta kurdî ya nûjen de beşdar bûye dimîne.

2- helbestvanên kurd kême in, ne pirin. Mebesta min ewe yê pirpîşe ku dîwanên wan hene ne yê hezker, em Karin bêtir li gorî jimarê kurdan kême in.

3- nebeşdariya rexnesaziyê, ya ku helbestê pêşdixe û dihêle helbestvan qelsî û şaşiyên xwe bibîne, û nahêle ji rêbaza ku tede dinivîsîne derkeve, ev ji ber ku rexnevanên kurd tune ne, û yê ku divê warî de dixebitin jî, di helbesta kurdî de ne pisporin.

4- Têgihîştin bi ezmûnên gelên din re tune ye, ew ezmûnên ku di warê helbestsaziyê de dibîstanên mezin avakirine, wek nimûne, helbesta Erebi di riya şandên zanistî re kelk û sûd ji ya gelên rojavayê wergirtiye, wergerandin weşandine, çapkirine, ta ji wan dewletên ku ew mêtîngehkar kiribûn, lê helbesta kurdî li Sûriyê, tenê bandora erebi lê bûye.

5-Qelsbûna asta çanda helbestvanê kurd, dibe ku ha ji ezmûnên berî xwe tune be, ji bilî yê Erebi, Turkî...û hwd.

6- pêşketina helbesta kurdî bêhewtayî ye, ne pêşketneke qûnaxî ye, gav bi gave, û li gora bûyerên dîrokî û civakî ye, ji ber vê yekê, em dibînin guhestina ji rêbazekî bo ya din ne xweristî ye, rêxweşkirin jê re tune ye.

Piştî van nerînan, emê herin têge û destûra her rêbazekî, li ser helbestvanên ku di wî rêbazî de dinivîsîne peyrewkirinê bikin:

Xelek 2Kilasîkîyet

Di koka xwe de vedigere hunera helbestê ya Aristo û Horas û liser felsefa aqilmendî tîoriya lasyîkirin hatiye damezirandin û li helbestên Kevin dinere ku ew helbestên payeberz e yê dive jê bê vexwarin berê vê rêbazê li qata eristuqratî ye ango rewtiya xoyetî tê de qels e û rewtiya dastane tede xurte, kilasîkîyet di wêjeya Kevin de, li ba Yonan û Romana hebû, lê di dema nû de, li ser destê helbestvanê Firensî Piwalo nû bû. Dora sala 1650 bi navê hunera helbestê li ser navê Aristo pirtûkek weşand û ev rêbaz hate belgandin bi felsefa Dîkart re Taybetmendiyên kilasîkîyetê

1-Kilasîkîyet guhdanê li şewyê derberîne dîke.

Ev rêbaz gelek udê ji destûr û bîmyada re digrin avakirî ye li ser klasayîkirina nivîskarên Kevin û guhdana li şeweyê ew kişandin ku zelalkirinê bikin û bihêlin ku naverok xweristî be ji şeweyê re.

2-Dûrbûn ji xeyala bi bask û dûpatkirin li ser eşkerekirinê

3-Bikaranîna zimanê standard û dûrketin ji yê devkî

4-Giringiya durketina ji zoziyê ji ber ku kilasîkîyet ji jîrbêjiya aqilmendiyê dayikbûye.

5-Kilasîkîyet babetiyê dîrdikeve ji xweyîtiyê ji ber vê nûnerê bilind bikartîne wek leheng comerd siwar û hwd..

6-Helbestê dixwe xizmeta amojgarî û şîretkirin û fêrbûn û aqilmendiyê.

7-Helbestên kilasîkî serwada û yekitiya malik û kêşan diparêze

Ma gelo ev destûr û bînyad di helbestên kurdî de bikartîne û peyda bin?

Belê ez dibêjim piranî ji helbestên kurdî dikevin bin taybetmendiyê rêbaza kilasîkî ji ber ku serwada û bikêşane û zimanê standard bikartîne û li ser rêza helbestên kurdî yê Kevin bikartîne tê helbestvanê beşdar û xurt Cigerxwînê di vê

rêbazê de ez wî dibînim serokê vê rêbazê di helbestên kurdî de ezê wî nimûne bibim lê ji bilî Cigerxwîn baş helbestvanê kurd yê ku li ser vê rêbazê dinivîsîn wek Tîrêj, Bêbuhar, Keleş, Memûd Sebrî, Xelîl Sasûnî, Azad Hemo, Melevan Resûl, Dildarê Mîdî, Birahîm Ebdê, Adil salih heydo, Dîlanî, Emer Smayîl, Helîm Ebû Zêd, Mihemed elî hiso, sopar ari...û hwd Lê ji ber van sedeman jêr, Cigerxwîn serokê rêbaza kilasîkî di helbesta kurdî ya nûdem de dimîne: Jimarê helbestên wî gelek hemberî helbestvanên din Ji tevan kevin tire Xuyakirina destûr û bînyadên kilasîkîyetê di helbestên wî de eşkere

Bandore rênama wî li helbestvanê ku bi dûde hatine Ku em nimûna ji helbestên wî bibînin emê van taybetmendiyên bibînin:

Yekitiya malika ji ber em Karin rajin malika dawî ji helbestê bê tu bandor linaverokê bibe ji ber navê xwe tede tine Yekitiya serwadiyê Yekitiya kêşana.

Li ser rênama Feqê teyran, Cezîrî ye û bandora wan lê heye Amojgarî û şîretkirin ta bernamê fêrbûnê Bikaranîna ezmûnê nimûneyî Xeyal li ba wî qelse û tundiye li ser aqilmendiyê dikesozî li ba qelse Şiyarkirina emcadê kurda û lehengiya wan di dîrokê de

Nimûne

Azad Hemo

Binifşa narîn

Bi yasayî evîndarim bi danasîn Mem û Zînim
Ezim finda diîsî tim.... belê hem tîteka dînim
Ezim bilbil li nav baxan binifş û lal û nisrînim
Ezim yar û ezim dildar cudabûnê qe nabînim
Dema Ferhad xwe da kuştin...digot perwîzî şêrînim.

Sobarê Arî

EY WELATO

Ey welato pa kelato va li ser sînga xêşim
Her zinatî , çend şelatî xwendina kurdî neşim
Em nenasin nêv himêzên dayik û bavê xwede
Xwînmîja sînor didanîn bin firok û hilxîşim
Herdemî yasa dixwênin lê welatê min ne tê
Havilê xakê dimêjin ez tenê va bê beşim
Min li cîhanê nihêrî mû serî wêran hemî
Kes nema îro li bindest ez tenê mam bextreşim

Melevan Resûl

MEHRÎCAN

Pêşî silav , pat û dirûd min bo we hemya pir hene
Ê kû li dûr yan jê li vir geştik hemî nêv dil dene
pey va ciwan nazik bedew tîxim gulek xunca bi ken
Nîşan di ber sînga dikim neqşê ji zîv navê wene
Saloq giha gotin Melev îro cirîd wê darkeve
Qoşma siwarê bê rikêb her yek bi ser navê xwe ve
Birga ji ber toxa zemîn sayis divê xweş pêrewin
Ka kî li pêş zûtir giha wê zîv bi para wî keve

Birahîm Ebdî

BILBIL Û RUWÊ YARA MIN

Heger bilbil ruwê yara m bibîne
Nema çarkê li gulzaran dixwîne
Ewê bigrî li jîna xwey buhirtî
Bi derd û kul û dilêş wê bimîne
Ji kerba wê bi nehp û nikkilê xwe
Gulên ser çuqliyan wê dawêşîne

Bêbuhar – Yûsiv Beraî

Kesê blindest

Kesê bindest ji dujmin ew netrsê
Lidij dujmin divê ew dest hilînê
Lidij dujmin serî deynê bi tirsê
Ne mafê wî li dinya jîn bimînê
Kesê tirsok heroj dimrê li dunya
Kesê mêt rojekê dimrê di jînê
Kesê tirsok bi saxî nav mirî ew
Kesê mêt xas ku mir lê nav dimînê
Wekî baz wê li ser çiyayê bilind bê
Bi azadî jiyana xweş bibînê

Dildarê Mîdî

Rewşa Mala min

Dara xemilandî bi êmîş û ber û sorgul
Bayê sipîdê lê didî, vî alî, wî alî
Ev hewş xemilandî bi kêf û kar û xebatê
Hetanî kû saxim li jînê herdem li balî
Herçar çêlîkê şêran li dora te diçin tîn
Pir şane digel herdû xatûnokê delalê
"Aram" û "Nebez", bi hevdûre "Riza" û "Zana"
"Pêla" û "Heya", radikîna govendê xwemalî

Cigerxwîn

LI DINYÊ BÊSERÎ

Milletê kurd her tenê maye li dinyê bê serî
Bes yekî tî tede nîne, her 'eşîrek sed kerî
Rencberin bê rêberin, dijmin li ser wan tim siwar
Tev mela û şêx û sofî, tev mirîd û serserî
Begler û axa egît in, dijminên kurdin ji dil
Rêberin bo kuştin û talan û ceng û beriberî

HEY QEHREMAN MILLETÊ KURD

Hey qehreman milletê kurd şerme tu razî
Meydan bidî dijmin û li qada te bibazî
Herçar terefan cîgehê teh'qîr û tinazî
Ger heq tu nexwazî kiye heqê te bixwazî
Heyfe tu kurê Rustem û Guhderz û Selahî
Îro tu di gundê beg û axa de felahî
Şerm û esefe, ger tu bi zarê xwe nexwênî
Raborî û şopa xwe li tarîxê nebênî
Bê qîmet û teqdîr çî ji dijmin re biçênî
Ta kengî her û her bi vî rengî tu bimênî
Keko ez bilûrvanim
Keko ez bilûrvanim
Bi her tiştî dizanim
Çiyatênim govendî
Bexê mîjo di bendî
Bê xwendin rez û mal
Ezê çibkim pîr û kal
Bi guv guv û bi nalîn
Kurd rsnabî cigerxwîn

Nezanî bargiranî

Ez û tû kîne
Çine ev newal û şax
Hebûn û nebûn çine
Çine ev av û ev ax
Kaniya jînê bingeh û jêder
Lê ji ku hatine em hemî

Tîrêj

PÊŞMÊRGÊ ME

Rabe tîfingê hilî, pêşmêrgê me
Rexta bavê ser wî milî, pêşmêrgê me
Tu b'şer û ceng û gilî, pêşmêrgê me
Tola me kurda hilî, pêşmêrgê me
Bê şer û ceng û xebat, pêşmêrgê me
Nabî azad ev welat, pêşmêrgê me
Şengaî û Tor û Xelat, pêşmêrgê me
Pêk ve dixwazin felat, pêşmêrgê me

Xeleka 3 Romansiyet

Bi giştî romansiyet şoreşek bû li ser rêbaza kilasîkî û li ser hemû destûr û binyadê wê û em Karîn bêjin ku romansiyet şoreşek rizgarkirinê bû ji destdanîna wêjeya Igrîqî û Romanîya Kevin mebesta romansiyê ji helbijartina vî navî da cidabûnê têxin navbera dîrok rewşenbîriya netewî û wêjeya xwe û ya Igrîqî û latîniya kevin lê gelek nîrên siyasî û civakî û abûrî gihîştin hev rêxweşkirin bo deketina romansiyetê ji wan şoreşa firensî û pirînsîp dadewerî mafê mirovan û romansiyet derberînek durust bû ji nerînên mirovatî re û wekhevî û azadiyê re û romansiyet derberîna durust bû ji rêrewa xoyetî re û ji xeyala bibak re dîrî hişkbûna aqilmendî û jîrbêjî û desûrên zîwa

Taybetmendiyên romansiyetê

1-Romansiyet wêjeya sozê ye û rizgarkirina wijdane wêjeya xeyal û azadiyê ye destdavêje xweristê û strana û xweyîtiye vedigere li serdema mirovatî û nihênîne kesane

2- Cihê tekane di civakê de bilind kirin ne wek kilasîkiyê ku girindgî da tevayê û qata desthilat û ya erustuqratî.

3-Guhdana êşa, azarî, gazin û reşbîniyê û guhdanê endamê xweristê wek çema û çiyayan dike.

4-Tiştê herî giring di rêbaza romansî de guhdana li azadiyê û vexwendina ji bo rizgarkirinê ji sitem û genîtî û xwîn mijiyê.

Romansiyet xuyaye bi nerîna reşbînayî û reşbîniyê li jîwarê ji ber ku tede eş û birîn ditîtin ji ber vê em dibînin piranî ji babetên wan axaftine li ser şevê, êvarê û demên ku xemgînî û melûlî tede hebe lê giringe li ba wan rastiya sozê ye û kûrbûna ezmûna hest, zîmanê bi kartînin nêzîkî yê rojane ye, dîrî zarawên dijwar dirin û doza mafê jîna dikirin û pêre sozdar bûn ji ber vê em dibînin helbesta romansî tenê tede eş û xeyal dîrî wutara yeksere Piştî vê zelalkirinê li ser rêbaza romansiyetê, ka em bibînin bê rewşa helbesta kurdî ya romansî çiyê. Li gora agahdariya min û dîwanên helbestvanên kurd yê pîrpişe ku ketine destên min, helbestvanê kurd ku taybet li ser vê rêbazê nivîsibe tune ne lê em helbestên romansî li ba gelek ji kilasîkiya dibînin

Nimûne

Tîrêj

ÇAYÊ AZERBEYCANÊ

De rabe ey dilo jaro
Heya kengî di hiznê da
Menale ez bi gorî bim
Di vê zîndan û hebsê da
Tu zanî ku li ser te ez
Bi nak û xem xem û şîn im
Şev û rojan hedan nakim
Ji ber jana ku tu tê da
Eger nakî ji min bawer
Were bik pirsyarê tu
Ji êşa û hêstirên çavan
Ji canê tim keser tê da
Ji xew rabûne va her kes
Berî dane rîya jînê
Li şûnwarê tu mayî bes
Di nîv dûman û tozê da
Hezar heyf û mixabin ku
Tu îroma ye bê tevger
Rîya bapîr û kalê xwe
Te berda ye bi çolê de
Di heyamê kevin, bûrî
Hemî gernas û rêber bûn
Ku bav û kal û bapîrên
Te deng da bûn di dinê da
Eger nakî ji min bawer
Binêre tu li Araratê
Dijî tenha wekî ley lan
Ji xwîna sor di şînê da
Eger nakî tu hêj bawer
Here Amed bipirse tu
Ji darsêpya xwedî wêran
Çiqas ser çûn di jorê da
Ji Amed tu vege dîsa
Berê xwe bid Mehabadê
Li ser çayê Azerbeycan
Tu raweste di jorê da
Tu dîna xwe bide axa
Çiya û deşt û rûbaran

BILBILÊ DILŞADÎ

Ey bilbilê dilşadî hela, wer bike fîxan
Derdê me girane ey bira, birîna me kûr e
Gorî te bitin cerg û dil û mēlak ê hem can
Dengê te ye xweştir, ji ney û nay û bilûrê
Sê hawe te deng, yek ji sira bayê siba ye
Hawayê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye
Hawê sisîya ji bihna şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e
Karwanê me va bi rê ketî, lê şevreş û tarî
Serma ye terez kulyên di berfê her dibarî
Bahoz e çelapek tene me, ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval, rêça me dîr e
Çar hawîr me diz û keleş in, tēk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin bir bi bir, heyf û mixa bin
Qet çarew umîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeçel, gur zûre zûr e
Meydane ji bo hirç û çeçel, rovî û keftar
Gorî te bim bilbil, ji serê darê tu wer xwar
Da pêk ve mijûl bim, bi xwe çend rojên di dijwar
Îro li me ferman e, li ser gerdenê şûr e
Destê tewqyê îro ku em herdu bidin hev Çe

Cigerxwîn

DILÊ CEGERXWÎN

Agir bi Kurdistanê ket lewra dîkî haware dil
Sed bax û sed bistanî ket manendî bilbil jare dil
Pêtek ji Kurdistanê hat, mēlak û cergê min dipat
nd sal û zemanên di xerab jîn em di gel hev
Aman welat aman welat, bawer bikin xwîn xware dil
Bawer bikin ey yarê min, heval û hem guhdarê min
Hergav û her êvarê min, naxoş û hem bêzare dil



Bêzar û pir naxoşe ew , kincên siyah gûn poşe ew
Geh Sîne geh Seydoşe ew , geh Heyderê kerrare dil
Geh Rusteme , geh Hateme , geh padîşahê Dey leme
Bê yar û dost û hemdeme , lew mest û gerdenxware dil
Geh şahe ew , geh bê kese , geh kurde ew , geh farise
Geh Berbere , geh Çerkese , geh Tirke geh Tatara dil
Geh çole geh zozane ew , geh Dêrike geh Wane ew

DERDAN ÇI EZ

Derdan çî ez diljar kirim ey felek
Îdî nikarim bêj mirim bûn gelek
Barê xizanî jî li min hîn ne bes
Serda ji pîsara çî ez bûm henek
O O O
Mêrên gemar îro hemû pêş ketin
Karê nebaş îro ji war baş ketin
Kûçik li ser hestiyar bi lez kom dibin
Mêrên durust nabin xulam paş ketin
O O O
Wê tişt nebê parek ji çem qels dibê
Bah tê gemar dajo li ser kom dibê
Lê qet gemar av çeman nagirê
Av xurt bibê dajo gemar pak dibê
O O O
Zor nê bimin birçî u bê war u jar
Lê baz tucar naxwê ji koştê mirar
Zanî tucar nabim xulam ey felek
Tim bergirim razî me ez bêbuhar
O O O
Cerdên xeman wan dest li min dane hev
Pêşda bi lez ew tîn bimeş geh bi rev
Piştî ku ez mam bêbuhar narevim
Dem bê bi cengê ez bixim wan ji hev

ferhad içmo

Hêvî

Heger jiyar bibe derya
evîna te bi min pêle
heger viyar bibe tembûr
evîna te li ser tèle
heger bihar bin ax bibe
evîna te xaç û kêle
di nav pencê eş û xewna
evîndarim min nehêle
* * *
Evîna te hey vek geşe
dema sitêr winda dibin
li pêş çava xewnek xweşe
bi wê omîd şiyar dibin
mizgîniya bayê reşe
gava kanî zuha dibin
evîna te hêvya dile
dema hêvî cuda dibin
* * *
Evîna te hat bişavtin
di kanîkên xewn û xwînê
bû kulîlkek ji rengê dil
li zozanê Feraşînê
di şikefta Şanîdarê
berî hêsrên Mem û Zînê
evîna te di dest min de
bû kilîta deryê Jînê
* * *
Li ser lêvên birîna dil
evîna te sazêk zîze
seba digrî berî sîga
piştî dengê te dibîhêze
li dor pêtên şemala te
dilê sotî hîn dilîze
bihara geş li bê yara
şevêk sare yan payîze

Xeleka4 Jiwarî

Jîwarî ya Kevin di xerbê de xuya bûye di nîvê seda
nozdan de dibin bandora ramanên zanistî û felsefî û
aqilmendî de ew bersiva xeyal û soziya romansiyetê ye,
jîwarî li ser kezakirî avadibe wek ku kodakek wêna be
tiştêkî tede naguhere û berfireh li hûr û mûran digere û
aqilmende durrî sozîyê ye lê jîwariya nû avadibe li ser
idyolocia sosyalistî û derberîna dema nû ye û tekoşîn
kêferat û eşa wî werdigerîne.
Û tevgera dîrokê dînîvîsîne û ew encama serketina
sosyalistê ye ji alîkî ji aliyê din encama serketina tevgera
netewî û civakî di dewletên cîhana sêyem de.
Di van xalê jêrîn de em herdû jîwara bidin ber hev.
1-mirov di jîwara Kevin de bêçare ango ne bi destê xwe
ye lê mirov di jîwara nû de bi destê xwe ye ne bêçare.
2-jîwara Kevin li jîwarê dinere û wî lasayîkirnê dike wek
wêna jê re bikîşîne lê jîwara nû li jîwarê diner bi çavê
tevgerî ew guhertî ye û tê guhertin.
3-jîwara Kevin reşbîniye ye lê ya nû geşbînayetî ye
dibîne ku civak tê guhertin bi alî xweşîye de wêje tede
doza rizgariyê dike wêjvan alî kariyê di avakirina civakê
de dike û di xwaze wê biguhere rewşeke xweştir û
pêşketî, tede wekhevî û mirovatî hebe ji ber van wêje di
rêbaza jîwarî ya nû de çekê çalake û wêjvan
berhemhênerê di civakê de.
Naverok û şêwe di wêje de ji hev cuda nabin ji ber ku
wêje ye qata karker ji millet re tê nivîsandin û ji bo wî ye.
Ma gelo helbestvanên kurd divê rêbazê de xebitîne

Nimûne

Sofî Elî

Şêrîn Gêlo

((di roja şewata sinema Amûdê de pir perçe ji zarokên
şewitî weşiyabûn nav tirafa sînemê . Serîk bû – dest bûn
– ling bûn ... Ew perçe li ser ereba Sofî Elî kirin ta
bighîne nav termên li Mizgeftê rastkirî li bendî xwediyên
wan bîn ta wan nasbikin û veşêrin ... Sofî Elî ji jinekê
pîrsî got : Sarê we termê xwe naskir ..?
Sarê jîna kezêb şewitî li Sofî ve gerand))
Sofî nîşana me xwuyaye
Şana paş tilîkê lingaye
Mala xwedê ava termê
Mehmûd ne windaye
Lêê ... Mehmûdê min sipehî bû ! ?
Ken û şahî şejna civata wî bû
Xemla hundurê min ..
Pêjina tevgera wî bû ...
Şekirê hilandî para wî bû
Çima rengê wî ji rengê demê
Reş tarî bû ... !?!!
Û li min mal xerabê ..
Îro temen lê bi dawî bû
« Sofî di nav hêstiran re bi dengêkî şewat bandikir :
werin bacanê reş û deng Sarê di guhê wê de bandikir »
De lorî berxê bavê mino lorî
Ez bi gorî destê Qelemê lorî
Ez bi gorî cilê qetyayî lorî
Ez bi gorî zikê birçî ... qirka ziwa
Çavên tirsayî lorî
Û de banke Sofî Elî banke
Werin kezêbê şewitî
Werin sinbilê dilan
Hey looo Sofî .. tû çî bandike
tû çî Difroşe ...
Barê te ne tê kirîn û ne tê firotin
Werin kezêbê şewitî
Werin sinbilê dilan
Werin baskê çivîkan
Werin lepê Kivroşka
Werin peryê hehecîkan

Wey looo Sofî tû çî bandike tû çî dike
hewarAgir sinbilê dilê me xwar
Agir avêt Mizgeftên bajar
Agir Bajar ji berêvde xwar
Agir avêt kirasê ka'bê *
Agir avêt kefenê Pêximber
Ew kiyê Agir li her çar aliyên dinyayê dadaye
Û wê kî avekê li vê Dojehê ke

Diya Ciwan

Kurê min

Rabe ser xwe kurê min
ronahiya çavê min
semyano pêmayê min
perçek j' nava dilê min.
Rab' û banke xweha xwe
bişon dest û ruwê xwe
taze şehkin serê xwe
maçkin dê û bavê xwe.
Werin rûnin bi tevdîr
bixwin vexwin nan û şîr
yan hinek hêk û penîr
yan jî ji vê dimsa tîr.
Da bilind be bejna we
ronî were çavê we
da xurt bibe laşê we
baş vebe zanîna we.
Cilê xwendinê l' xwe kin
pirtûka di tûrê xwe kin
desta di destê hev kin
armancê l' pêşya xwe kin.
Sûnda min bi serê we
ava nake warê we
şahyê nayne dilê we
ji bilî zanîna we

Tîrêj

Sîpan û perwîn

Rojek ji rojên buhara rengîn
Ez diçûme ser çiyayê metîn
Çiyakî bilind hemî ber û dar
Li jorê çiyê gelfî û zinar
Li dev newalan hemî bax û rez
Li binya çiyê hemî êl û pez
Bi nermî sura bayê siba tê
Dengê orîna hov û teba tê
Şalûr û bilbil bi qîr û hawar
Xumxuma ava ji kanî ne sar
Civîk û tîtî mirxê baz belek
Seyranê dikin bi ref û bi tek
Di nîva gula ser giyayê şîn
Xwe vedgevezin bi şadî û jîn
Ji nêv wa den ga ji gelîkî kûr
Bakurî çiyê ji cihekî kûr
Dengê hate min nalînek şewat
Can û ceger û dilê min dipat
Rabûme ser xwe zû û ne dereng
Berê xwe mi da gelyê kûr û teng
Daketim xwarê berê mi'l gelfî
Tev teht û kelem bê ax û xwelfî
Berê min kete şikeftek mezin
Mi dî di şikeftê kalek û di jin
Kalo pal daye li ser xakî ser
Bê merş û kulav reben ew hejar
Kum û kolos di bin serê wî
Kîs û qalûnek li pêş berê wî
Serî weke kak rîha wî sipî
Kincine xilmet kiras û derpî
Berê xwe daye hêla vî alî
Kalê heftê sal ji kûr dinalî
Pîrek rûniştî jinek xwedî şan

Yeke navûser temtêlek giran
Fala qencyê li rû xuya bû
Malbatek mezin keça keya bû
Ya dî qîzeke xweşik dev li ken
Gelekî bi rewî dev û lêv û çen
Bejneke zirav çavî reş belek
Dêmen sorgulî porên reş xelek
Kêmasî nebû li bejn û balê
Ebrû kevanê Rustemê zalê
Pîrê rûniştî teşyê dirêşî
Lê keç pî nakî zer dihêvêşî
Lê pa çî bêjim heyf û mexabin
Yên ku wisa qenc ev halê wan bin
Di orta wan de agirî qurma
Xwe lê dane hev hemû ji serma
Dawya şikeftê kulînek bê kêr
Beroş û zerik cerek av û kêr
Hemî bê ma'd û bê çehr û bê reng
Bi ax û keser ne peyv û ne deng
Mi xweş dizanî ji tevgera wan
Işek pir giran hatî serê wan
Mi got malîno siba we bi xêr
Kalo helestî piya we bi xêr
Got gelkî bi xêr mêvanê delal

Cegerxwîn

XANIYÊ COTYARA

Xanîkî kûr teng , li dor çar dîwar ,
Li ser wî pûş û li bin beşt û dar
Sifirne û şirik bi kunc û eywan
Bi kulek û refik hem bi nêrdewan
Her çar dîwarên wî ji ax û av
Mal û sermiyan zar û zêç û nav
Kulav û balîf û doşek û mitêl
Beroş û mersef , hem teşt û hem sêl
Qadûlk û kodik kaxik û hîzik
Meşk û 'eyarşîr , cewdik û dîzik
Misîn û legan sênî û rûnpêj
Moxil û bêjing , serad û girbêj
Hestîf û maşik , tîfik , xaçîrgan
Bêr û zembîl û bivîr û dûstan
EZ MIROVIM Ez mirovi
Markisîme , dixwazim
Li her derî dibazim
Kûbîme serfirazim
Berî her tistî kurdim
Sofyatîme bîrwer
Asyewîme bi tevger
Berî her tistî kurdim
Li efrîqa dikim ser
Li ewrûpa dikim ger
Berî her tistî kurdim

CEJNA HEFTÊ SALÊ SITALÎN

Ey Sitalînê mezin , her her bijî amalê tû
Xoş û pîroz û ciwan bî cejnê heftê salê tû
Rêç û şopên Markis û Lênî te girtin ser bi ser
Renberên kurd û cîhan tev leşker û havalê tû
(Zerrey a) sermayedaran zerreyek nabî ji dil
Fîkr û mal û can bicarek milk û may û malê tû
Karker û pale li karin , dest bi das û tevr û bêr
Tev li pêşin xweş di vê rê , şûr û xweş mertalê tû
Carekê ferman bikî zû herne pêş , wê herne pêş

HUN ÇI ZANIN ŞER ÇIYE

Pîj û ber dibarin firenek , top û teng
Bi gîrîn , bi xumîn bûye şer , bûye ceng
Kumişîn , hilweşîn xan û bircên belek
Genî bûn , kurmî bûn pir kelaş pir cedek
Bi singo , bi gulle didirin , dikuvin
Sergever , çavbeloq , dev ji hev mêt û jin !
Dil bi tirs diçin hev bi qulûz , bi dizî

Ser hasin bi tiving , bê hêvî , bê xwezî
Şevereş bi birûsk , bi çirûsk bi tavan
Bi qêrîn , bi nalîn , bi hawar , bi aman

KÎ DIVÊ ŞER KÎ DIVÊ SELAM

Hevalên delal û hêja û dîn divên selam
Gulçîçek û gulnaz û nesrîn divên selam
Av , avanî , sera û xanî divên selam
Tim dilovanî û insanî divên selam
Evîndar û Şêrîn û Zîn divên selam
Hey hevalan ê wek Sitalîn divên selam
Divê em bêjin mêt û jin tamam
Bijî Sitalîn her bijî selam
Ew mirovên dîn û nezan tim dixwazin şer
Ê bê dîn û îman û wijdan dixwazin şer
Ên divên kuştin û talan dixwazin şer
Xwedî mal û fabrîkên giran dixwazin şer
Koledar û dijminê insan dixwazin şer
Mirovên xwînmij wek Tiroman dixwazin şer
Divê em bêjin mêt û jin tamam
Bijî Sitalîn her bijî selam

SEYDA Û PÎR SITALÎN

Seydayê zana , pîrê Sitalîn
Ala me hilda ala sê rengîn
Ew perda rûreş ji ser me hilda
Rojek geş derket , sitêra kurda
Ketin gora teng Faşist û Nazî
Bextê me ê geş Qazî kir 'xazî
Belê dîwarê xanî me danî
Lê ku nebin yek naçin wî xanî
Xanedanê kurd hemî bibin yek
Na , ez pir şaşim tev şivan û beg
Divê em hemî bi hev re bakin
Vî kabûsê xurt ji ser xwe rakin
Hemî yekin em nijadê kurdin
Damarê laşek , yek jan û derdîn
Gava tilya min gez dikî pêşî
Laşê min hemî seraser dêşî
Karker û cotkar renberên welat
Abûrî çiyê , tev kar û xebat
Dema şikestin Nazî û Faşist
Nîvê dinyayê bû ye Qumunist
Ji bo me divên pir fidakarî
Ji guh xwe bavên îdî neyarî
Milletê mezin , bê mezin nabî
Mirovê mezin divê yekta bî
Selav li ser we ey gelî xortan
Ey keçên zana , ciwanê kurdan
Ji hev re bêjin , ta em nebin yek
Bi kêr me nayên ev bircên belek
Di gundên xwe de em tev şivan in
Di xana xwe de em dergevan in

PEYMANA ETLESÎ

Peymana bê kêr hilf a Etlesî
Kar û fêda xwe nadî tu kesî
Roja ev peyman derkevî meydan
Serê xwe hildin faşistê Elman
Devê xwe vekin dîsa ceng û şer
Tev daqurtênin insan û beşer
Ev bax û bustan , ev qesr û qonax
Hemî hilweşin dîsa bibin ax
Di nav linga de bimrin ev zarok
Ev keçên ciwan bibin pîrhevok
Gava biteqî qembera zerrî

HEVAL POL ROBSON

Ey heval Robson dengbêjê cihan
Paşmêrê selam zana û insane
Gernas û rênas , dijminê Dalas

Di ser ava re , di ser çiya re
Rengê te ê reş tê ber çavê me
Dengê te ê xweş , xweş tê guhê me
Ev xebata te didî me hêrzan
Kêferata te didî me lerzan
Ev tevgera te ji bona insan
Pir jê ditirsîn axa û dehqan
Xwedî sermiyan ji te ditirsîn
Hemî xanedan ji hev dipirsîn
Dibêjin reşik çawa şiyar bûn ?
Destê hev girtin li ber me rabûn
Dalas ditirsî weke Mak-Arsî
Di ber piyan çûn pir tac û kursî
Xwedî sermiyan serê xwe hildan
Dibezin , dilerzin , dicivin , direvin
Ji meydan

DIYAN-BIYAN-FÛ

Diy an-biy an-fû , Diy an-biy an-fû !
Lingê koledar ji ser te rabû
Kurên te gernas xwe dane kuştin
Navek pir giran ji bo te hiştin
Tîpên azadî kuştin koledar
Noşîcan bî , te xwîna wî vexwar
Dema ku serê koledar dişkî
Nizanim çima Dalas dipîşkî
Cî lê teng dibî , gurê dev bi xwîn
Serê wî dêşî divê Espirîn
Diy an-biy an-fû , Diy an-biy an-fû !
Hewrê koledar ji hev bela bû
Ew hewrê kirêt tev reş û tarî
Zor û birçîbûn tim jê dibarî
Bayê azadî , sewra Oktobir
Ev hewrê tarî ji hev belakir
Dengê Hoşî - Mîn pir xurt û hiner
Waye lêdidî sa'eta zefer
Dilê te dagirt tasîr li te kir
Li dijmin bûyî hêtûna agir

Xelk 5 Helbestên nûjen

Ev celeb ji helbestê di nîvê seda bîstan de derket ,gelek taybetmendiyê wê hene giringê wan evin:

1-derketina ji kêşana helbestî ya teqlîdî , û ji ziman û wêneyên ku bikar dihat , û afirandina çiroka helbestî û şanogeriya helbestî ,gelek nav li van helbesta hatine kirin , ya nû ya nûjen , yan serbest , ya bêserî û ne wek yên kevin ku li ser du şetra avdibe , ev celeb ji helbestê encama pêşketina ramanî û hunerî bû.

2-ne li ser kêşana derve avadibe , ya ku behrê erûdî bikartîne , lê ava dibe li ser kêşan û îqaea hundurî ya ku bi rewşa nefîsî ve girêdayî , ango nesaz îqaiê di nefîsê de , ev dihêle ku helbest nesaz be , li gorî wê îqaiê , ji ber vê helbestvan gotina û tîpan dubare dike , û iitmadê li ser tîpên kurt û dirêj dike , û tîpên bi deng û yên den kurt , û guhertina hevokan , wek yên bang û istifhamê ,û hevokên salixdanî , gelek serwaya bi kar tine dîre ji wutara yekser , di derberîn de û li ser tarîkî û simbola ava dibe , û wêneyên tevger û reng tede hebin bikartîne , lê tiştê herî giring di helbesta nûjen de , simbolê efsane û hemû endamên folklor û kevnetorê gelêrî û mirovatî ye , û ji hêla naverokê hemû babetên jîyanê tede heye.

Emê bêne ser helbesta kurdî ya nûjen , helbesta kurdî divê demê de berê wê bipiranî li ya nû ye û jimara helbestvanên ku vê helbestê dinivîsîn in pirin wek:

Dildarê Aştî , Memûd Badilî , Ciwan Nebî , Şêrîn Gêlo , Narîn Umer , Beşîr Mela , Nisrîn Têlo , Ebidelsemed Mehmûd , Diya Ciwan , Konêreş , Dîlan Şewqî , Hozanê Girkundê , Ehmedê Xursî , Mişelê Osman , Ferhadê Içmo , Bêwar birahîm , selwa hesen t. d
Di dawîde dixwazim nîşan bikim ku di helbestên kurdî de rêbaza sfitî he yak u ava kirî ye li ser hezkirina xwedan û pêxemberê islamê tede helbestvan bêtirî zimanekî bikartîne lê mixabin di dema nû de min tu helbestvanê kurd ku li ser vê rêbazê bnivîsîne nebihîstiyê û ev rêbaz taybet afirandina helbestvanê misilmana ye wek Melêcezirî Celaledîn Elromî Mihyedîn Bin Erebi Umer Elxeyam.

Alîkariya zarawên wêjeyî Mamoste **berzo mehmûd** Mamoste **xalid miheme**
Têbîn zarawên bi ren gê sor hatine nîv isandin bi zimanê erebî Lê ve ger a rêzimanî: **B. dara**

kurdî	عربي	kurdî	عربي	kurdî	عربي
alav / amêr	ادوات	dadayetî	الادائية	kezakirin	النقل الحرفي
hokakar / ho / sedem	اسباب	wate / geyandin / gihandin	الدلالة	nimûne	النموذج
binema, bineret	اسس	xoyetî, ezyetî	الذات	hezker	الهاوي
agadarî	اطلاع	xoyetî	الذاتية	peyker	الهيكلية
dahênan	الابداع	simbolîzm	الرمزية	jîwar	الواقع
kilasîkiyet	الاتباعية	romansiyet	الرومانسية	jîwarê sosyaliştî	الواقعية الاشتراكية
rêrewa xoyetî	الاتجاه الذاتي	romansiyet riyalîzm	الرومانسية الواقعية	jîwariya kevin û nû	الواقعية القديمة والجديدة
rewtiya dastane	الاتجاه الملحمي	çîrokbêjî	السرود	wujdan	الوجدان
bûyerên civak	الاحداث الاجتماعية	reşbînayî	السوداوية	kêş/kêşan	الوزن (الوزن الشعري)
bûyerên dîrokî	الاحداث التاريخية	destdanîn	السيطرة	amojgarî/şîretkirin	الوعظ
wêje	الاداب	helbesta nûjen	الشعر الحديث	bername	برنامج
wêjeya mizgînîdan	الادب التبشيري	helbesta serbest/azad	الشعر الحر	welatên cîhana sêyem	بلدان العلم الثالث
mêtîngehkar	الإستعمل	helbesta bêserî	الشعر المرسل	ezmûn	تجربة
payeberz	الاسمى	şêwe	الشكل	pêşxistina gav bi gav / qonaxî	تطور مرحلي
bîrên zanyarî/zanistî	الأفكار العلمية	şêwey derve	الشكل الخارجي	rêxweşkirin	تمهيد
êş, nexweşî	الأم	şêwey navxo	الشكل الداخلي	Belgedanîn	توثيق
guhestina xweristî	الانتقال الطبيعي	şêwey giştî	الشكل العلم	nûdem	حديث العهد
impireşenizim	الانطباعية	sofîti/sofiyet	الصوفية	taybetmendî	خصائص
başî	الايجاب	soz	العاطفة	bertek	ردة فعل
rezima navxoyî	الإيقاع الداخلي	dadwerî	العدل	çekê kartêker/çalak	سلاح فعال
kêşazî	البحر العروضي	nûdem	العصر الحديث	helbesta pîk	شعر التفعيلة
damezirandin	التأسيس	endam, ilement	العناصر	Rastiya soz	صدق العاطفة
dûpatkirin / teqze	التاكيد	tarîkî, lêlayî	الغموض	bêhawtayî	طفرة
tê/bê / werê / jêr	التالية	takane, takperestî	الفردية	sozdar	عاطفي
rizgarkirin	التحرر	standard	الفصحى	Aqilane, aqilmendî	عقلاني
wergerandin	الترجمة	bîra sosyaliştî	الفكر الإشتراكي	Beş	فصل
senterandin, dupatkirin	التركيز	serwa	القافية	çapter / beş / birra	فصل من كتاب
reşbînî	التشاؤم	kilasîkiyet	الكلاسيكية	felsefa miletan	فلسفة الشعوب
reşbînayetî	التشاؤمية	azarî	المأساة	destûr / bingeh	قواعد
peyrewkrin	التطبيق	pirinsîp	المبادئ	ciya/cuda	متمايز
pênasekirin	التعريف	wergêr	المترجم	nimûne	مثل
geşbînayetî	التقائلية	pipîşe	المحترف	Bêçare	مجبر
pîk	التفعيلة	dibîstanên wêjeyî	المدارس الأدبية	wutar/lêduwan	محاضرة
lasayîkirin	التقليد	rêrewên wêjeyî	المذاهب الأدبية	derwaze	مدخل
rêxweşkirin	التمهيد	azarî	المعاناة	qonax	مراحل
hevghiştin	التواصل	berweurdkirin	المقارنة	zarawe/têrim	مصطلح
nesazî	التوتر	pêşgotin	المقدمة	têge/têgeh	مفهوم
belgedanîn	التوثيق	rêbazên wêjeyî	المناهج الأدبية	serwadar	مقفي
ristey daran	الجملة الانشائية	jîrbêjî, locîk	المنطق	berhemhêner	منتج
nûxwazî, nûkarî	الحدائثة	babetî	الموضوعية	rêbaz	منهج
Nûxwazyetî, nûjenayetî	الحدائثية	şîret	الموعظة	kêşdar	موزون
aqilmendî	الحكمة	rexnesaz / pispor	الناقد المختص	dûpatkirin	نجزم
wutara yekser	الخطاب المباشر	belavkirin	النشر	tiyoriya lasyîkirin	نظرية المحاكاة
keyal	الخيال	tiyori	النظرية	yekîtiya malika	وحدة البيت
keyala bibask	الخيال المجنح	rexneya avaker / rexnesazî	النقد البناء	pêştgirêdan	يعتمد

Nimûne ji hin helbesta

SEL WA HESEN GERA LI EVÎNÊ

Ez geryam li te
 Dengê ji dûr dihat
 Ez geryam li te
 Di nav pêlên deryan de
 Di welatê bê behr û deryan de...!
 Di nav rûpelê dilê xwe de
 Vegeryam rûpelên pêşî
 Rûpelên ko te nivisan dibûn
 Bi ava gul û çîçekan
 Gulan digot:
 Bêhna me der bû ji
 Ewê evîna wey mezin
 Rewşa min digot:
 Lê ez dijîm li welatekî tev serme ye
 Rehê dilê min dimrin
 Li te digirim tu li ku ye..?
 Ez vegeryam li rûpelên dawî
 Tev de qitrana û tarî
 Nivisandî bû bi dilekî mirî
 Em ji te hez dikin...!!
 Heger hezkirina we ne rast be
 Ez jiyanim jiyaneke xweşim
 Keçek kurdîm bi rih û canim
 Ji we pir hez dikim
 Lê hûn wek pelê darê diweşin
 Bê rihîn...li ser we diqehrim
 Va min ew pelê dawî ji dilê xwe avêt...!!
 Ez vegeryam rûpelê pêşî
 Û îro ji bo wan dijîm
 Jiyaneke xweş, bi êş, kul û derd
 Ez geryam li miletekî ku ne canfiroş be
 Raperîneke ji Tîşkên Rojê
 Li şûna golên xwînê , emê darên Berûyan biçînin
 Li şûna termên şehîdan , emê gund û bajaran ava bikin
 Li şûna her hawar û qêrnekê , emê xwendin û zanîne , bi ronak bikin

Bêwar Brahîm.....

Îro li Qamişlo haware ,

Wê Pêwanên Bayê ,
 Li zingilên nêvroja xwînî bidin ,
 Hawarnameyên bê Efsêr û Leşker ...
 Di navbera mirin û dewrebariyê de , bilind bibin ,
 Dehlên Berûyan , li nav pêlên agir ,
 Wê bi deya , rewa û geş bibin
 Hêsi û rondikên 40 milyon Kurd ,
 Li ser pîrên westayî
 Bi ronaka xwîna Qamişlo re biçirisin ,

 Aşotiya bendîxanê
 Temoz Şemalî
 Li bendî daketina xewnan bû
 û spîndar li peydara sibehê
 ne berdêla xeman bû,
 giraniya dîlzariyê
 daxwaza veşartî bû
 lê encama çûyîna rokê
 nikarî ji bajarên kevirî re
 soz biguhartana.
 Serbilindiyê rojekê
 siya kendalekî veşartî
 ji sibehrojê re
 sar dikirin û
 bê dudilî dikenyan û dikenyan.
 Kêlik-kêlik çav li rê bûn
 û aşotiya di bin çenga tariyê de
 destber bû ku
 li gêdûkên şermgeha wê
 geh li xwe balîne çûyîne
 geh li kolanên xwejbîrkinê

xwe ji bîr bike û
 nepirse li vemirandina bîst û sê mûman
 ji kesên hêja re.
 Ew sîbera tazîbûna memikan
 li taldeyî dîwarekî zêrî
 birçîtiya dêwekî

Hoşeng Osê.....

Kolanên vî bajarî, tîrsa xwe bi ser pirsên vî havînê de dirjînin, û ez, sistaya baweriyên
 xwe bi şîrêza gumanên xwe pelçîm dikim.
 Hayê te ji min nîne, bê bêrkirina te, min xistiye kîjan dogehê.
 Hayê te ji min nîne, bê çawa kêlik bûne çal, û temenê min diqurtînin, hestiyên min
 dikojin û gewdê min dibrêjin.
 Hayê te ji min nîne bê çawa bûme kavlê kişwera xeman...
 Dengê min bûye nalîna bilûra şivanan...
 Çavên min qerimîn e.
 awirên min, yê sêwîyan e.
 siya min kût bûye.
 sitiriyên tenahiyê min duxin...
 Hema dikim bibim pesareke bê giya û pincar, bê teyr û tilûr û teba...
 xezalê, ka tu li kurî...??!
 * * *
 Xezalê...
 Ji êvara xwedê de, lûvlûva min e...
 Bi dest pelandinê, xwe dûrî oxireke reş dikim.
 Bi hêsiyên xwe, wateyan kedî dikim.
 Çalên dilên xwe, bi dilbijîna xewna xwe û te, dadigrim.
 Mîna loqekî heriya bi stirî, xweziya xwe diqurtînim.
 Te aramiyê bi xwe bire dadgehkirina bê, û min ji zixtên şevê re hiştiye, da min bikin
 komir...!
 Çima te min bi xwe re ne bire hêlîna xwedawendên xwe, ta nasbikin, bê evîndarê te kî
 ye, da di navbera min û welêt de şaş neke...?!.
 Doza helbesta min
 Mehmûd badilî
 Li pêş xwe binêre ..
 li dor xwe binêre ..
 şûna pêkên te..şûn mayên te ne
 bixwîne..
 veçire..
 birêse..
 eniya bilindî bi rûmet...
 doza helbesta mine.
 * * *
 Kevirê xwe....
 bavêje gola dilê min
 xêzên bê dawî bi xwîne
 qermîçekên rûkê mine....
 li binya xwe biner....
 di nêv wêneyên wan xêzan de
 t'ê xwe bibîne
 di sînga dildarê xwe de.
 * * *
 Li paş xwe binêre ...
 deryake kûre...
 pîrek zêrîne û kalekî mîre...
 her kes dibîne..wek ku nabîne
 Xura piştê naşkê
 û çavê birçî têr nabe

Dildarê Aştî

Xwena rêwîyekî

Di boşeyên helbestê de
 Bendewarî bûrîna miz gînekê
 Min peyvên xwe fêrî firê dikirin
 Pêxweşbûnekê digirtim
 Xewnan lîdor min distirand....
 Ji nişkave
 Çivîkekê xwe pelûkir pêxîla min
 Şin dibû
 Dîn dibû
 Didilîya.....
 Zîz dibû
 Lal dibû

Bê rewa dilûsiya...!!!

.....
 Deng li hev digeriyên
 Berî rîhan bîn semayê
 dibiliyan
 Bêhnên biyan
 difûriyan
 Ber bi başûrî pêjnê de
 Perwaneyan guhên xwe miç dikirin
 Bendewaran matmayî dîq dikirin



Sernivîser
Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê
Arşek Paravî

Desteya birêvebir


Pîr Rustem
Silêman Azer
Ezîz Xemcivîn

Derhener
Xorşîd Şûzî

Abdilbaqî Huseynî
Lawîn Şêxo

Ji bo hinartina berhemên kurdi: kurdi.penusanu@gmail.com

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**